

# welat

Sal:2 Hejmar: 79 22-28.Tebax 1993 5000TL (KDVD)

Rojnameya Hefteyî

## Dewlet Ayselê vedişêre

Di ser revandina nûçevana Özgür Gündemê Aysel Malkaç re 16 roj derbas bûn. Polîs hê jî binçavkirina Aysel Malkaç nagire ser xwe. Tevî hemû serlêdanan, hikûmet heta niha jî bo dîtina Aysel tu tişt nekiriye. Ji gelek sazî û komeleyên neteweyî û navneteweyî, jî hikûmetê re mesajên protestoyê têne şandin.

Rûpel 5



Di ronahiya 15'ê Tebaxê de li Melazgir, Dîgor û Gîhadînê meşa rizgariyê û livbaziyan gerîla

# Serhedê serî rakir

Rûpel 8



Di serhildanên Serhedê de dewletê jin û zarokan da ber fişekan. Lê tevî vê yekê gel her di berxwedanê de ye. Ji hevî û baweriya xwe tu tiştî wînda nekiriye. Di serlêdana heyeta DEP'ê de jî, ev yek bi awayekî vekirî xwe eşkere kir.



## CEHŞIKÊN ÇARPÊ Û DUPÊ

Di pirtûka muqeddes Qur'ana Kerîm de jî bo keran, "Înne enqere el eswatî le sewte el hemîrî" tê gotin. Ev gotin tê vê maneyê: "Dengê kerê jî hemû dangan xerabtir e." Li gora ola îslamê tu qîmeta keran nîn e. Di nav pîrr gelan de jî, ji mirovên bêaqil re, "ker" tê gotin.

Rûpel 7



## MA STENBOL DI HIMA ZERYA MA QANDÊ WELAT ERZENO

Ma xwi jî no lej miyan di vînenê. No lej, lejê ma yo. No lej, lejê neteweyî yo. Gowde ma lejî miyan di nî yo. Hima no lej fikrê ma di ro.

Rûpel 6

# Îro roja têkoşîna azadiyê ye

Bi navê Xwedê yê herî rastiya mezin. Heval Zahir! Pêşî daxwaziya silav, rahmet û bereketan li ser te dikim. Ji bo te jiyaneke azad, di welatekî serbixwe de dixwazim. Hêviya min ew hêvi ye tu, hevalên xwe û gelê xwe yên bindest, rizgar bibin.

Ev name ji bo şiyarkirina te dinivîsim. Sitemkar im (bi gazin im) û sitemkariya xwe fînim ziman.

Min hevpeyvîna te bi "Xalê Mihemet" re xwend.

Dilê min şikest. Xemgîn bûm. Neheqî ye. Heqaret e. Bi milyon gelê te, birayên te yên bi yekîtiya Xwedê bawer hene. Xwendevanên rojnameyên Lenînîst tenê nîn in. Çima bi pêsindarî di rojnameyê de Xalê Mihemed tê weşandin. Li hember felsefeya wê nîn im. Hurmeta min ji we re heye. Lê belê daxwaz dikim ku, hûn hurmetê bidin ola îslamê.

Gel hêj baş bi têkoşîna rizgariya neteweyî ya gel û

welêt û maf, ronahî nebûye. Îhtiyaca gel bi zanebûna dîroka Kurd û Kurdistanê heye. Welatperwerî, welatparêzî, evîna neteweyê serbixwe çî ye, çima em nizanin? Vê bi me bidin hînkirin. Vê ji bo me diyar bikin. Da ku rojek zûtir bindestî biqede.

Êdî xwîn nerije. Birakuji çênebe, esmanê me reş û tarî nebe. Îro roj, roja têkoşîna azadiyê ye. Bila ev evîn xurt bibe. Qels nebe. Bila evîna welêt û Kurdistanê

na serbixwe di dilên gel de şax bide. Bila hemû kar û xebatên me li ser vê bûyerê be. Di hiş û mejiyên me de ji evîna welêt, rizgarbûna ji bindestî pê ve tiştê çênebe. Ufuqa (asoya) xwe fireh bike. Nezera diqeta gel bi-kişînin ser demên derbasbûyî. Ser dîroka me.

Hêvîdar im ji bo xebatên we yên bi vî rengî.

Duadar im ji bo serkeftina we.

**Ayhanên Holiyen Xerzan**

## FERHENGOK

- Avjank:** Soberî, melevanî, soberberî
- Avhewa:** Klîma (iklim)
- Binaçe:** Nifşe, jenerasyon (kuşak, nesil)
- Birr:** Alî, grûp
- Cirm:** Sûc, tewan
- Cirr:** Ehlaq, qereker (huy)
- Çarik:** Terhî, meles, melxeme, xavik
- Destirman:** Rawestina esasi (esas duruş)
- Heste:** Çaqmaq (çakmak)
- Hêvişandin:** Muhefezekirin
- Ji xwe ve çûyin:** Ji dil ve çûyin, xeriqîn (bayılmak)
- Kayin:** Di devê xwe de cûtin, kavêjkirin (geviş getirmek)
- Pozberî:** Lihevixistin (çatışma)
- Pîle:** (derece)
- Pelîn:** Bi destan di tariyê de li tiştêkî gerîn
- Palandin:** Dawervandin (süzme)
- Palîn:** Dawervîn (süzülmek)
- Pixar:** Kulek, rojing (baca)
- Qerid:** Bijîn, xwestin, dil-xwestin (canî bir şey istemek)
- Rehilandin:** Lerizandin, ricifandin (titretmek (soğuktan))
- Rehilîn:** Lerizîn, ricifîn (titretmek)
- Rûniştvan:** Yên li cihekî ikamet dikin (sakin)
- Serrişt:** Dews (ipucu)
- Tavilê:** Di cih de (hemen)
- Şahredar:** Reysê belediye (belediye reisi)
- Terabe:** Xerabe
- Tivanc:** Tajan, jan, eş
- Xemşê:** Kara xezalê (ceylan yavrusu)
- Vejin:** Ji nû ve bûyin
- Wang:** Wiha, wisa, wilo, welê, werg, werr, werre

## Her tişt diyar e

Komara Tirk ji bandora tirsê têkoşîna rizgariya neteweya Kurdistanê, hov û harbûye. Bêyî aşiyê çî ji destê tê dide meşandin û bi kar tîne. Ji bo rawestandina têkoşîna rizgariya neteweyî yekîtiya sazûmankaran, partiyên, hêz û komeleyên Tirk û hevalbendên wan dixwaze. Bi kurtî ez bibêjim, ji bo tunekirina serhildana gelê Kurd, her hacet û politikayê dide meşandin. Hebûna xwe di tu-

nekirina PKK'ê de dibîne. Rast e, serkeftina gelê Kurd tunebûna wan û qedandina hovîtiya wan e. KT'ê, ji PKK'ê baş fêm kiriye, li gorî wê gavan diavêje, ger qala dana radyo, televizyon û perwerdekarîya Kurdî jî dike, ne ji bo berjewendiyên gelê Kurd e. Bi yek dengî bang dikin dibêjin her tişt ji bo tunekirina PKK'ê û serokatiya PKK'ê ye.

Dema ku KT bixwaze bi

berpirsiyarê gelê Kurd re rûnê, wê demê bizanin ku, ber bi mirinê û tunebûnê ve diçin. Wê demê, dayîna maf û pejiwandina-hebûna gelê Kurd, ji bo xwe ji mirinê xelas bike ye.

"Rojekê gurekî har dikeve nav koma pezê me, gelek mîhan birîndar dike û gelek jî dike, mezinên malê bi alîkariya gundiyan li gur dixînin, piştî û lingên gur dişkînin, gur li erdê dibê mîna berate, nikare laşê

xwe bilivîne. Zarokên gund li ser gur kom dibin. Zarokê darekî dikutî canê gur, gur bi carekê û xafîkî dev diavêje û ji navîkê zarok birîndar dike."

Sazûmana Tirk jî wilo ye, tu bawerî û hêvî pê nabe, girîng e ku nebe jî. Gelê Kurd yekemîn care gihîştîye yekîtiyêke wilo mezin û rêbertiyêke wilo bi hêz. Ev şer, şerê dawiyê ye, şerê hebûn û tunebûnê ye.

**Ahmet Barackiliç**

### Êdî bes e!

Hişyar bibe, bi xwe bihise  
Ka tu kî yî, ka çî kes î?  
Ji van zincîran werese  
Êdî bes e, êdî bes e.

Rabe ser xwe bike gazî  
Serbilind û serfiraz î  
Ser bikeve vî hevrazî  
Bila rabe belengazî.

Serê çiya mala te ye  
Penah û berpala te ye.  
Bilindahî ala te ye  
Hogir û hevala te ye.

Neyar ji te pirr ditirse  
Ta hatiye, dilerize.  
Bo çî tu mayî şepirze?  
Rabe, dadê xwe bipirse.

Serborîna xwe bîr bîne,  
Li ber çavan bibe bîne  
Ew çî jin e, ev çî şîn e?  
Rabe, îro têkoşîn e.

Çima ewqas hatî kotin?  
Tu hêjî çira têyî dotin?  
Bo çî her roj bêyî sotin?  
Ma ne bes e hinde gotin?

Hişyar bibe, bi xwe bihise  
Ka tu kî yî, ka çî kes î?  
Ji van zincîran werese  
Êdî bes e, êdî bes e.

**Semsê Kurdi**

### Zarokên Agirîstanê

Agir dirije ji çavê wan  
Ew ... Ew çavagiran...  
Agirê wan  
Ji delaliya çavan  
Dimeşin li ser agiran

Hildikşin  
Ji zozanên Kato...  
Çavê wan  
Çavê delalê zarokan...  
lûjî

Dîrok diveciye ji wan  
Ew, ew dibêjin  
Li meydana şer û dilan

Deng didin Seyîd Riza  
Deng didin qerîna Aryan  
Bila neqedin zarokên welatê

Bi qeydan û bi lûlê tîfingan  
Bi eşqa delalan

Bila neqedin zarokên welatê  
min  
Bila bimeşe qewmê min...  
Li Dêrsimê wek kulîlkê

Grîdaxê berf û bahozan

Bila fedî bikin Zerdest û  
Nemrûd

Ger wan derxistan

Dolê zilmê ji axa Aryan...  
Ger wan bişûştan axa Aryan  
Ji xwîna mirovan...  
Ji sikûmê qirêj  
Ji wecê bi xwîn  
Ji rûreş û neyarê mirovahiyan  
Wan barbaran, wan

çavxwînan  
Nedibûn jahra mejiyan  
Nedibûn kelem... Ji eşqa Mem  
û Zînan

Zarokên welatê min  
Wan ... Ew çavagiran  
Di nav çiyân  
Xwîn, can, rewan...  
Neviyên Rêberan  
Xwînfiroş û qewmfiroşan  
Ku nedibin yar ji xwedan û  
ji goran

"Çî feyde..." nagihîje dilê min  
Gulle... Û gemara wan

Lê nazdar û giranê bedelê  
eşqan

Kawa vejîyaye ji xewan  
Ji âlazê Qesra Nînova  
Ew... Mizgîn û rûkenê

**Seyîd Çiya**

### Merheba Welat

Ez xwendekarê Welat Berzindan Koçer im. Gelî birayên min, ev ên ku dixwazin hînî Kurdî bibin bila bînin em bi hev re tev hîn bibin. Ev tişt dê zehf li xweşiya min biçe, ji ber ku em dê hem zimanê xwe fêr bibin, hem jî hevûdin nas bikin.

Dema min hîn nû dest bi xwendina Welat kiribû, min digot çiqas zor e, lê gav bi gav em hîn bûm. Ên

wek min difikirin bila piçêkî zorê bidin xwe, li ser peyvikên nû bixebitin. Ji ber bikin. Me tenê yek rojname heye em piştgiriya wê bikin.

Em xwendekarên Welat in  
Şivanên ser çiya nin  
Her dem dikin jî xebat  
Bixwînin gesta Welat.  
Ev deng dengê Welat e.

**Berzindan Koçer Bilis**

### PÎROZBAHÎ

Hevalên me yên welatparêz  
**Leyla Qeredax û Halîs Alkoç**  
roja 19'ê Tebaxê zewicîn.  
Di jiyana wan a nû de em wan pîroz dikin.

**Li ser navê heval û malbata wan Nuredîn Alkoç**

# Li Cizîrê şahiya 15'ê Tebaxê

**Cizîr, Welat-** Cizîra Botan, di 15'ê Tebaxê de dîsa mala dawetê bû. Di şevê de li heft cihan Cizîrî dilan danîbûn. Li hêlek dilan û li hêlekê jî di nav dilanê de degê dirûşmeyên, "Bijî PKK", "Bijî Serok Apo" dihat.

Gerîlayên ARGK'ê di nav bajarê Cizîrê de nemaze di nav Taxa Cûdî de bi gel re bûn. Gerîla jî gelê Cizîrê re wiha digotin: "Şeva me bi dilan û şahî wê derbas bibe." Di 15'ê Tebaxê de dengê saz, def, zimneyê heta 10'ê şevê dom kir. Ji 10'ê şevê û pê de gel, bi tilîlî berê xwe dan malên xwe, di bin kontrola milîs û gerîlayan de.

Ji bo ku hêzên dewletê nekevin nava Taxa Cûdî, gerîla û milîsên gel weke pilingan li nava Cizîrê digeriyan û serê kuçeyan girtibûn. Di vê şevê de zarokên biçûk, keçên ciwan, kalê



Gelê Cizîrê 15'ê Tebaxê bi çoşeke cejnê pîrozbahî kir.

80 salî her kes dilan û kêf dikir.

Kalîkek wiha dipeyivî: "15'ê Tebaxê jî gelê Kurdistanê re jiyaneke nû, rûpeleke paqij vekir."

Çiyayên Cûdî û Gebar ew şev dixwestin dengê tilîliyan,

dengên sloganan guhdarî bikin. Lê hêzên dewletê dîsa bi tanq û panzerên xwe li ser Cizîrê gulle reşandin.

Li Botanê gel 15'ê Tebaxê, bi şahî û bi dilan, li gundan jî bi def û zimneyan derbas kirin.


## Walî newêrin herin Kurdistanê

**Navenda Nûçeyan-** Weke hemû leşker, polis, rêvebir û ravedarên dewletê walî jî, ji çûna Kurdistanê ditirsin. Dewlet, li şûna Waliyê Herêmê yê niha Ûnal Erkan, jî bo walîtiya herêmê li mirovekî nû digere. Lê tu kes xwe nêzî vê peywîrê nake. Waliyên bajarên din ên ku teklîfa walîtiya herêmê jî wan re hatiye kirin, jî bo ku ev kar li ser milên wan nemîne, li dû torpîlan digerin. Waliyê herêmê yê niha Ûnal Erkan, bi hinceta ku êdî westiyaye dixwaze xwe jî vî barî xelas bike. Lê, tu kes nayê dîtî ku bikeve şûna wî. Ji ber vê yekê jî, jî mehekê ve ye qerarnamaya waliyên ku dê bêne guhertin, li ber destê Wezîrê Karê

Hundirîn Mehmet Gazioğlu sekinandî ye û nayê îlankirin.

Li gorî çavkaniyan, heta niha teklîfa walîtiya herêmê li 8 waliyên bajarên din hatiye kirin. Di nava wan de, Waliyê Çanakkale Hüsni Tuğlu û yê Mersinê Çetin Birmek jî hene. Lê ev hemû walî vê teklîfê red kirin û jî bo peywîra walîtiya herêmê bi şaşîti li ser wan nemîne, bi lez li dû torpîlan geriyan.

Ji dema ku şerê çekdarî yê PKK'ê dest pê kiriye, dewlet di şandina peywirdaran ên jî bo Kurdistanê de, astengiyên mezin dikişîne. Tevî ku pereyê mezin didin kesên ku li Kurdistanê kar dikin jî, tu kes bi dilê xwe naçe Kurdistanê, ên ku diçin jî



Ûnal Erkan

bi darê zorê û jî tirs ku, dê karê wan jî destê wan here diçin.

## Dewlet bi destê kontrgerîla dikuje

**Navenda Nûçeyan-** Êrişên kontrgerîla, yê li hember welatparêzên Kurd, roj bi roj zêdetir û dijwartir dibin. Li Batman û Amedê, di rojekê de 4 kes jî aliyê vê hêza dewletê ya veşartî ve hatin kuştin, 2 kes jî birîndar bûn.

Li Amedê, roja 18'ê Tebaxê, kontrgerîla êrişî 2 karkeran kirin. Bûyer li Taxa Baxlar pêk hat. Ji herdu karkeran Celal Kanat li cihê bûyerê mir, Halîs Kuzu jî, bi birînen xedar birîndar bû. Celal Kanat, di "Karayollarî" de şofêrî dikir û bavê 2 zarokan bû. Li gor beyanên şahidan, yek jî qatilan 18-19 salî, yê din jî 15-16 salî bûye.

Dîsa li Amedê, li Taxa Mergemedê; berberêk li navê xwe Abdulhalik Şaşmaz, wek mirovek welatparêz tê nasîn û berê jî, dikana wî bi bombe hati-bû şewitandin.

Li Batmanê jî, êrişên kont-

trgerîla bi hemû diwariya xwe ve didomin. Roja 18'ê Tebaxê 3 kes bi êrişa kontrgerîla hatin kuştin. Êriş li Taxa İpragazê pêk hat û Bahdettin Çelîk, Mehmet

Saîtoğlu û Mehmet Sevîm li cihê bûyerê mirin, jî kuştîyan cenazê Mehmet Sevîm, li gundê wî Bêkandê ku li ser Misircê ye hate binaxkirin.

## Tîman cerdî ser mala nûçevanê me yê Edenê kirin

Roja 15'ê Tebaxê tîmên taybetî nûçevan (muxabîr) û belavkerê rojnameya me tevî malbata wî xistin bin çav.

Hêzên dewletê êrişên xwe yê li dijî rojnamevanan didomin. Nûçevan û xwendevanên rojnameya me zehf caran jî ber xwendin û danxwendina Welat tîmên girtin û îşkenceyê dibînin.

Roja 15'ê Tebaxê li Edenê, Taxa Dağlioğlu tîmên taybetî girtin ser mala nûçevan û belavkerê Welat Mehmet Kizilkaya. Tîm dest danî ser zêdeyî hezar heb rojnameyên Welat yê ku jî bo belavkirinê li mala Mehmet Kizilkaya bûn. Dû re tîman Mehmet Kizilkaya û malîyên wî birin qereqolê. Li qereqolê zêdehî deh saetan îfadeya wan hate girtin, heqeret li wan hate kirin û dû re hatin berdan.

# HAWAR

Dilbixwîn

## Nameyeke vekirî ji Ferhat Tepe re

**H**evalê Ferhat te hejmara dawiyê ya rojnameya xwe xwend? Li ser rûpela yekemîn wêneyê te heyê, çarçoveya wêneyê reş hatiye xêzkirin. Tu dizanî çima?

Dewleta ku te bikuje dewleteke alçax e! Eger ne nizim be, te nakuje. Ji bo dewletê kuştina te zafereke pîrr mezin e, wiha texmîn dike, lê ji bo me êdî kuştin bûye sirûd û marşa jiyane.

Gelo, welatê ku jiyana lê tune be ma mirin jî tune ye? Divê mirina me deng bide. Mirina ku deng jê neyê, mirar bûne, mirina bi deng mirina şerefê ye, mirina serfirazî û şahnazîyê ye. Lewre du rengên mirinê hene: Jiyan, mirin. Em jî bo jiyane dimirin, ne jî bo mirinê. Bawer bike hevalê Ferhat, em bi navê jiyane nikarin xwe di nava mirinê de bihêlin. Êdî hew em dikarin xwe bi rengên sexte bixapînin.

Tu ne şehîdê destpêkê yî, ne jî yê dawiyê yî. Meşa me meşeke dirêj e, bi çend gavan dawî nayê, bi çend hevokan çîrok jî naqede. Demekê digotin Kurd leşkerên biyaniyan in, îro dibêjin li ser pozê her zinarekî gerîlayekî Kurd heyê, her şikeftêk nexweşxaneyek e, çiyayên Kurdistanê bûne navendên pêşketin û parastina mirovahiyê. Gelo, êdî kesek cesaret dike bibêje Kurd leşkerên xelkê ne?! Bawer nakim.

**Hemû rê diçin Kurdistanê. Riyên diçin Kurdistanê riyên me ne, şehîdên li ser wan riyan jî şehîdên me ne. Em weke ku tîfingên hevalên xwe yê şoreşger li erdê û bêxwedî nahêlin, wisa pênuşên hevalên xwe yê rojnemevan jî bi tenê nahêlin. Rastî wê neyên veşartin. Pênûsa gel e, çawa ku tu hêz nikarin û wê nikaribin meşa gelê me rawestînin, her pênuşên me jî di qada rûmetê de li ber xwe bidin.**

Di nava vê rêveçûna rûmetê de, te jî cihê xwe girt. Ne tenê kuştin, tu fetîsandin. Mirov dikare çî navî li vê hovîtiyê bike? Ji vê terora reş û hikûmeta li pişt birêvebirina wê ez tiştêkî fêm dikim. Tu caran tirs nikare me jî ser biryarê vegêrine, eger armanc tirsandin be, kuştina me jî mirinê xelas dike, em jî kuştinê natirsîn, eger armanc kuştina me be! Berik tu caran nikarin dengê me nizim bikin, jî mîj ve me çarçoveya bêdengî û dengnizmiyê qetandiyê, eger armanc deng-

daxistina me be. Ji serxwebûnê re em fedaî ne, mixabin hîna hikûmeta terorê em nas nekirine.

Hevalê hêja!

Dîsa tu di nava hevalan de yî. Bi wan re li ser gelê û pîrs-girêkên welat diaxifî. Hevaltiya şehîdan çawa ye?

Li vir êdî em li ser pîrsên biçûk nasekinin, xwe bi tiştên wiha erzan re jî mijûl nakin. We bi barkirina xwe re barê me giran kir. We bi şehadeta xwe berpîrsiyariya me mezin kir. Lewma jî em neçar in, di bin serokatîya hemdemî de ji nû ve dirokê binivîsinin û hîni berpîrsiyarî û barhîlgirtinê bibin. Êdî rûpela kevin bersiva pîrsa îro nade.

Her tişt xwe nû dike. Em jî nû dibin, pêşve diçin û tu tişt nikare li pêşiya me bibe kelem. Destên me çî bigirin emê wê hilînin. Eger tîfing be tîfing, pênuş be jî pênuş jî bo ku em bibin xwediyên jiyane û rûpela mirinê bitewînin, emê jî banga azadiyê re amade bin.

Hemû rê diçin Kurdistanê. Riyên diçin Kurdistanê riyên me ne, şehîdên li ser wan riyan jî şehîdên me ne. Em weke ku tîfingên hevalên xwe yê şoreşger li erdê û bêxwedî nahêlin, wisa pênuşên hevalên xwe yê rojnemevan jî bi tenê nahêlin. Rastî wê neyên veşartin. Pênûsa gel e, çawa ku tu hêz nikarin û wê nikaribin meşa gelê me rawestînin, her wiha wê pênuşên me jî di qada rûmetê de li ber xwe bidin.

Bila bibêjin "nivîskarên terorîst", em welatê xwe diparêzin, daxwaz û armancên gelê xwe tînin ziman. Tenê ferhenga dewleta Tirk nav li vê yekê dike terorîzm, lê hema kesek jî wê ferhengê bawer nake.

Li dawiyê ez dixwazim nameya xwe wisa biqedînim. Ji hevalan re bibêje, bi milyonan gel ber bi berbanga azadiyê ve diçe, çavên her kesî li benda tîrêjên rojê ne...

**Libyayê daxwaza Ewrûpayê redand**

Libyayê bi daxuyenekê roja 16'ê Tebaxê daxwaza dewletên Rojavayê ji bo teslîmkirina tewanbarên Libyayî redand (red kir). Li gor daxwaznameya van dewletan, teslîmkirina du kesan heta 1'ê Cotmehê divê çêbe, nexwe dê biryarên li hemberî Libyayê bê standin.

Li ser vê daxwaznameyê, Wezaretê Karên Derve yê Libyayê daxuyaniyek weşand. Di wir de Wezaretê Karên Derve yê Libyayê wiha dibêje: "Em dixwazin li ser vê meseleyê li hev kirin çêbibin, lê divê danişîna van kesan bi awayekî dadmendî û rûmetdarî be. Ev tişt jî divê bi sazûmanîkariya Sekreterê Giştî yê NY'ê Boutros Ghali çêbibe, em jî bo vî tiştî bang li NY'ê dikin."

Lê dewletên wek DYA, Brîtanya (Îngilîstan) û Fransa ev tişt nepejirandin û bi tundî daxwazê ducar kirin xwestin ku, biryarên tûj li hemberî Libyayê bê girtin û ku ew heta 1'ê Cotmehê wan kesan teslîm bike.

Tiştên di daxuyaniya Libyayê de tîz ziman pêşniyara Kadafi (serokê Libya) jî bo danişîna van kesan li welatên xeynî DYA û Brîtanya jî di hundirîne.

DYA û Brîtanya, ji bo bombekirina balefirek Pan-Am 103 û mirina 270 mirovan li Îskoçyayê, li bajarê Lockerbie di sala 1988'an de du kesên Libyayê tewandar dike û Fransa jî bombekirina balefireke UTA li ser Nijeryayê di sala 1989'an de ku tê de 170 kes mirin, dixwe stûyê kesên Libyayî û teslîmkirina wan dixwazin.

**Hîzbulahî**

**7 leşkerên Îsraîl kuştin**

Roja 19'ê Tebaxê Hîzbulahiyan bombe avêtin qereqoleke Îsraîl ku li Başûrê Lubnanê ye, 7 leşkerên Îsraîl mirin û bi hindikahî 2 kes jî birîndar bûn. Ev bûyer jî 1988 vir ve êrişê herî serkevtî bû. Çavkaniyên Hîzbulah gotin ku, piştî teqîna bombeyê qereqol rûxiyaye, Îsraîl mirî û birîndarên xwe bi helikopteran birine nexweşxaneyan. Dîsa eynî çavkaniyan dan xuyan ku, bi kêmahî tanqek jî îmhaya bûye. Hîzbulahiyan diyar kirin ku, ew êriş jî bo salvegera mizgefta El-Aksa ku li Qudûsê di 21'ê Tebaxa 1969'an de hatibû şewitandin, çêbûye. Li dû vê êrişê, balefirên Îsraîl jî bo tohildanê hinek hedefên li Geliyê Bekaa bombe kirin.

**Li Misirê êrişê hêzên îslamî**

**Nûçeyên Derve-** Li Misirê, roja 18'ê Tebaxa 1993'yan hêzên îslamî di erebeyên Wezîrê Karên Hundirîn Hasan El-Elfi de bombe teqandin û bi çekên giran êrişê birin ser; xwestin wî bikujin. Di vê bûyerê de bi kêmayî 4 kes mirin, yek jî wan parêzkerê wezîr bû, wezîr bi xwe jî birîndar bû.

Hikûmeta Misirê li hemberî hêzên îslamî ev bû 19 meh e ku, şerekî dijwar dike. Ev olperestên radikâl jî bo şerîetê li hemberî dewleta laîk şer dikin.

Ev êriş li navenda bajarê Kahireyê, (paytext) "nêzîkî avahiyên wezaretan, balyozxaneyên Japonî û Amerîkî çêbû, lê tu zirar negihîşt van avahiyan.

Hêzên îslamî li Misirê heta niha gelek êrişên bi vî rengî çêkirine. Rêxistinên ku navê wan wek berpirsiyarê vê bûyerê derbas dibe, El-Gamaa el-Îslamiye û Gruba Îslamî ku girêdahiyê Şêx Omer Abdel Rahman e.



Êrişên hêzên îslamî yên li dijî dewleta Misirê serêşeke mezin e ji bo rayedarên dewletê.

**Mirov çawa bi qirkirinan dihise?**

**Norwec, Welat-** Der barê bûyerên ku li Kurdistanê diqewimînde, em li Ewrûpayê dibin xwedî agahiyên dubendî. Di vî warî de ajans û weşanên Ewrûpayê û Kurd hedîseyan jî hev cuda didin. Di nav dayîna bûyeran de dubendî peyda dibin. Mînak, di van rojên dawî de me ji ajansên Kurd bihîstin ku, di roja 15'ê Tebaxê de li bajarê Melazgîrê nêzî 50 mirovên sîvil ên Kurd jî hêla dewletê ve hatin kuştin. Radyoya Norwecê ev bûyer wek; "Doh dewleta Tirkîyê 100'ê zêdetir gerîlayên Kurd kuştin", da û ajansa 'Anadolu' jî wek çavkanî nîşan kir. Roja berê jî rojnameyên Norwecê -Dagbladet jî di navê dan nîşan ku di şerê nav leşkerên Tirk û gerîlayên Kurd de ku li

nêzî Cûlemêrgê pêk hatî ye 69 gerîlayên Kurd û di meşa bajarê Serhedê de jî 9 sîvil jî hêla dewletê ve hatine kuştin. Çavkaniya wan dîsa wek berê ajansa 'Anadolu'yê bû. Ev jî du meh zêdetir e ku, nûçedayîna ketiyê vî rengî. Me jî bo 'ku hîna van dubendiyan bin û hedîseyan zelal bikin, sedema vê yekê jî hinek ajans û rojnameyên Norwecê pirsî. Wan bersivên pirsên me wilo dan:

- Ji ber bêderfetiyan li Tirkîyê nûçevanên me kêma in. Nûçevanên hinek ajansên mezin wek BBC, Reuter û hwd. hebin jî li Stenbol wan deran in. Ji ber vê yekê em ji ajansa Anadolu'yê nûçeyan digirin. Ji xeynî Anadolu'yê kesek jî herêma ku tê de şer heye, bûyeran nade.

Li ser pirsê me, "Ma çima li Îsraîlê mirovek tê kuştin, hûn vê yekê didin, lê li Kurdistanê hûn qîmeta xwe bi ajansa Anadolu'yê tinin", jî wiha gotin:

- Îsraîl jî her çend sîvilan bikuje û wek dagirker bê nasîna jî, li wir demokrasiyek heye. Em her wext xwe digihînin hedîseyan. Lê, Tirkîye ne wilo ye. Her tişt di bin sensûrê de ye. Nahêle kesek bikeve cihê hedîseyan. Welatê ku tê de serbestiya çapemeniyê tune be, dibe dîktator. Kijan welat dibe bila bibe.

- Di Şerê Cîhanê yê Duyemîn de Norwec jî hêla Almaniyaya Hitler ve hatibû dagirkirin. Di vî şerî de hêzên Hitler qirkirînan mezin pêk anîn. Mirov kuştin, cih, war şewitandin. Lê, Norwecî

jî vala nesekînin. Wan bi îmkânên xwe yên bi filmên amatorî gelek qirkirînan Almanî derxistin ber çavên dinyayê. Dema bûyerekek pêk bihata, meşek çêbiba û di meşê de Almanan gulle bireşanda ser gel, gundek bihata şewitandin ev yek di cih de jî hêla Norweciyan ve dihat kişandin. Li Bosnyayê jî, wan gelek serpêhatiyên wilo bi îmkânên xwe film kirin û di cih de dan ajansên dinyayê. Tu dikarî heta dawî biqêrî û bibêjî bî sedan, bi hezaran mirovên me tene kuştin, kesek guhdarî nake û ew wek xeyaletê tîne. Lê, çapemeniya dinyayê, dikare dinyê rake ser lîngan. Ev jî di destê we de ye. Divê gelê Kurd bi ajans û çapemeniya dinyayê re jî, têkiliyên bi bir û bawerî daye.

**Navçeyeye din jî ji destê Azeriyan çû**

**Nûçeyên Derve-** Ermeniyên li hemberî Azeriyan didomînin. Nogorno Qerebaxê êrişên xwe Roja 19'ê Tebaxê hêzên Erme-

niyan bi êrişekê, navçeyê Cebrail ku li başûrê Azerbeycanê, nêzîkî sînorê Îranê ye bi dest xist. Wezîrê Parêziyê yê Azeriyan daxuyand ku, piştî şerekî xedar 4 rojan dom kir, Cebrail ket.



Leşkerên Ermenî, piştî gelek gund û navçeyan, navçeyê Cebrailê jî, bi dest xistin. Niha jî, ber bi navçeyê Fuzûlî ve dimeşin.

Îranê li ser vê bûyerê Ermenîstan protesto kir. Wezîrê Karê Derve yê Alî Ekber Welayetî, li Bakuyê di civîna çapemeniyekê de wiha got: "Em dixwazin yekê erdên Azerbeycan bê parastin, ji lew re em êrişên Ermenîstanê yên li dijî niştecihên navçeyên sîvil protesto dikin."

Demeke dirêj e ku, bajarê Fuzulî jî aliyê Ermeniyên ve hatiye dorpeçkirin, ketina vê navçeyê keyseke mezin da Ermeniyên. Ji berê ve hinek bajarên weke Kelbecer û Akdam ketibûn destê Ermeniyên.

Konsûla NY'ê ya Ewlekariyê Ermenîstan protesto kir û jê, vekîşîna jî cihê dagirkerî xwest û ev êrişên bi vî rengî weke êrişên li dijî domana aştîyê nixand. KT'ê jî, li ser vê mijarê daxuyaniyek belav kir. Piştî protestoyeke tûj, tê gotin yê ku êrişbaziyê dike divê tiştên piştî vê bêna jî bigirin ber çavan.

Wek tê zanîn li ser erdê Nogorno Qerebaxê Azerî û Ermenî demeke dirêj e ku, di şer de ne. Ji ber ku, ew herêm di nava erdê Azeriyan de ye û niştecihên herêmê bi pirranî Ermenî ne û ji Azerbeycanê veqetîne dixwazin. Tevlîheviya di navber Azeriyan de rewşa wan xerab dike. Piştî serhildana Sûret Huseyinov niha jî, li rojhilatê başûr Alî İkrâm Hikmetov serî hildaye.

## Li Tirkîyê kî ne diz e?

Tirkîye, ji nû ve bi fîdayên dizî û bertîlê, ji hîmê xwe ve diheje. Heta niha tu hikûmeta ku bi diziyê nehatiye sūcdarkirin û çend rayedarên wê nehate mahkemekirin nîn e. Her hikûmeta ku tê ser kar, pêşî der mafê hikûmeta çuyî de doşayên diziyê ve dike û hin kes tene mehkemekirin, carina jî mehkûm dibin. Hikûmeta koalîsyonê ya DYP û SHP'ê jî, vê kevneşopê şopandin û bi dehan mehkeme li ANAP'ê û wezîrên wê vekirin. Hê encama wan mehkemeyan nehate bî girtin, vê carê ANAP'ê dosyaya ÎLKŞAN'ê ku saziyeke mamosteyan e, vekir û hikûmeta koalîsyonê bi diziyê sūcdar kir. Niha jî rayedarek ji belediya Stenbolê ku serokê ÎSKÎ'yê bû bi bertîlstandinê tê sūcdarkirin. Ev sūcdarî, tenê bi Serokê ÎSKÎ'yê Ergun Göknel jî namîne û navê Serokê Belediya Stenbolê Nurettin Sözen, Wezîrê Xebatê Mehmet Moğultay û gelek rayedarên din jî, di vê skandalê de tene bilêvkirin.

Di dema her hikûmetê de, bi trilyonan pere ji dewletê tê dizîn. Dizî û bertîlstandin, ekonomiya Tirkîyê xerab dike û ji hîmê xwe ve dewletê dihejîne. Kîjan hikûmet were serî, ev rastî naguhere û pîrseke dijwar di serê gel de cihê xwe digire: Li Tirkîyê kî ne diz e?

## 'Li hember şer derkevin'

Piştî kampanyaya DEP'ê ya "Aştiya Giştî", niha jî Komîteya Biratiya Gelan, ji bo li hemberderketina şer, li kedkar, karker, demokrat û sosyalîstan bangêk weşandin. Di banga komîteyê de, tê xwestin ku ev hêzên han, li hember şerê ku, niha li Kurdistanê tê meşandin derkevin. Komîteya Biratiya Gelan, ji Yalçın Küçük, Münir Ceylan, Mahmut Kilinç, Hüseyin Aykol, Fethi Yıldız û Niyazi Armutlu pêk tê. Ev banga komîteyê, di civîneke ji bo çapemeniyê de hat belavkirin. Civîna roja 17'ê Tebaxê, li Stenbolê di avahiya KMM'ê (İHD) de çebû. Banga komîteyê ji aliyê Niyazi Armutlu ve hate xwendin. Ji xeynî rojnamevanan, gelek nûnerên DEP'ê yê jî navçeyên cur be cur ji beşdarî civînê bûbûn.

Banga Komîteya Biratiya Gelan, bi kurtî wiha ye: Dewlet li hember gelên Kurd û Tirk, şerê xwe yê qirêj her roj hinekî din dijwarî dike. Ev çîna serdest a kedxwar, dixwaze li Tirkîyê têkoşîna demokrasî û sosyalîzmê, li Kurdistanê jî şerê rizgariya neteweyî tune bike. Di vê rewşê de, divê gelê Kurd û Tirk, li hember vî şerê qirêj têkoşîna xwe ya hevpar bilind bikin. Li ser nava KMM'ê Yüksel Hoş jî daxuyand ku de heta dawiyê piştgirî bidin doza Kurdî û ji bo wê bixebitin.

# Fehmî Işıklar hem ji dêrê bû hem jî ji mizgeftê


**Navenda Nûçeyan-** Biryara Dadgeha Qanûnê Bîngehîn, a der barê girtina HEP'ê de di Rojnameya Fermî de hate weşandin û ev biryar derbasî jiyane bû. Bi girtina HEP'ê re mebusiya Fehmî Işıklar ku di dawewekirinê de serokê vî partiyê bû jî ket. Dadgeha Qanûnê Bîngehîn, Fehmî Işıklar bi axaftinên wî, wek sebebê girtina HEP'ê sūcdar kiribû.

Fehmî Işıklar piştî ku di listeya SHP'ê de ji Diyarbekir

wek mebus hatibû hilbijartin, venegeriyabû HEP'ê û di nava refên SHP'ê de heta Cîgiriya Serokatiya Mecîlsa Tirk bilind bûbû. Işıklar bi vî tewra xwe di nava hilbijêrên xwe yê Kurd de, weke mirovekî xayîn hatibû bilêvkirin. Lê, piştî ku der barê HEP'ê de doza girtinê hate vekirin jî, dîsa zirara mezîna wî dit. Bi vî rewşa xwe jî veke gotineke pêşiyên Kurdan hem ji dêrê bû hem jî, ji mizgeftê.

Piştî kifş bûbû ku de mebusiya Fehmî Işıklar bikeve, di meclîsa Tirk û bi taybetî di nava SHP'ê de biryarek wiha wek biryarek anti-demokratîk hatibû nirxandin. Ji van hêlan, sozên destekdayînê ji bo Işıklar bilind bûbûn. Lê di nava pêvajoyê de ev soz hatin jîbîrkirin û Işıklar bi serê xwe ma.

Dû re jî mebusiya wî ket. Li gorî vî qanûnî, Fehmî Işıklar êdî nikare dawewekê û çareya vegeerê nîn e.



Fehmî Işıklar

## Telabanî ji bo Kerkûkê ji Tirkîyê alîkarî xwest



Celal Telabanî

**Navenda Nûçeyan-** Celal Telabanî bi mebesta rizgarkirina bajarê Kerkûkê ji dewleta Tirk daxwaza alîkariyê kir.

Serokê YNK'ê Celal Telabanî di hevpeyvîneke xwe de ku bi rojnameya Turkish Daily News'ê re roja 17 Tebaxê çekiribû, ji Tirkîyeyê ji bo rizgarkirina bajarê Kerkûkê ku ji alî neftê (petrolê) ve dewlemend e alîkarî xwest.

Mam Celal di vî hevpeyvînê de wiha got: "Werin em tev Kerkûkê ji Ereban bistînin, xeta boriyan vekin û ji neftê tev îstifade

bikin. Heke Tirkîye alîkariya me bike, ev tişt gelek hêsan e, ji bo vî yekê biryara konsûla Nete-weyên Yekbûyî ya ewlekariyê jî divê. Em ji bo çî petrola xwe ji tewandarê (sūcdar) cengê re bihêlin."

Telabanî li ser meseleya Kurdî û dewletên herêmî jî got ku, hevkarî û li hev civînên dewletên wek Tirkîye, Îran û Suriyeyê, di nav Kurdan de hestên Pan-Kurdîst xurt dike.

Heke ew dewlet li dijî Kurdan hevkarîyê bikin, Kurd jî dê li

hemberî wan hêza xwe bikin yek û ev jî dê li herêmê encamên bi xetere (talûke) bi xwe re bîne."

Mam Celal li ser PKK'ê jî ditinên xwe anî ziman û wiha got: "Serokê Partiya Karkerên Kurdistanê Abdullah Öcalan, ji bo şerrawestîne amadekariyê dike, heke Tirkîye bersiveke erênî (pozîtîf) bide." Di dawiyê de jî got ku, ew herdu aliyan serwest dibîne, bi şer ev mesele çareser nabe û ne êrişên Tirkan ne jî yên Kurdan tiştek bi ser tiştekî naxin.

## Têkiliyên Siyonîzm û Tûranîzmê

**Navenda Nûçeyan-** Tirkîye, li hember têkoşîna azadiya Kurd, li Rojhilata Navîn ji xwe re li hevalbendên nû digere. Di destpêkê de, bi vî armancê bi dewletên Erebe re li dî xurtkirina têkiliyan geriya. Wisa dixuyê ku, ji dewletên Erebe alîkariya ku dixwest negirtiye. Ji ber vî jî niha bi dewletek wek xwe qetliamkar û dagirker re têkiliyên nû bi pêş ve dike.

Ev jî demekê ve ye têkiliyên Tirkîyê û Îsraîlê dikeve pêvajoyeke nû. Ev herdu dewletên dagirker, dixwazin ji tecrûbeyên hev feyde bibînin. Îsraîl, bi şerê xwe yê li hember Filistîniyan ji bo Tirkîyê mînak e. Niha Tirkîye dixwaze hem ji van tecrûbeyan îstifade bike, hem jî bi alîkariya Îsraîlê li Lubnanê li hember hêzên PKK'ê êrişan pêk bîne.

**Navenda Nûçeyan-** Di ser revandina nûçeyana Özgür Gündemê Aysel Malkaç re 16 roj derbas bûn. Polis hê jî binçavkirina Aysel Malkaç nagire ser xwe. Tevî hemû serlêdanan, hikûmet heta niha jî bo dîtina Aysel tu tişt nekiriye. Ji gelek sazî û komeleyên neteweyî û navneteweyî, ji hikûmetê re mesajên protestoyê tene şandin. Tirs hemûyan ev e ku, Aysel ji mîna Ferhat Tepe hatibe kuştin.

Li Almanyayê, ji Rêveberiya Eyaleta Ren Westvalye ya Bakur, nûnerên Partiya Keskan û Yekîtiya 90 Angelîka Lange-

Tirkîye di politikayên xwe yê derve de, hêzên xwe yê faşîst û nijadperest bi kar tîne. Destpêka danûstandinên Tirkîyê û Îsraîlê, bi têkiliyên Yahûdîyan û Serokê MHP'ê Alpaslan Türkeş ve girêdayî ye. Weke tê zanîn, ev partiya faşîst, di têkiliyên dewletên Qefkas û Tirkîyeyê de jî, xwedî roleke girîng bû. Serokê vî partiyê Alpaslan Türkeş, li van dewletên nijadîst, nûneriya berjewendiyên Dewleta Tirk dikir. Her çîqas ev politikayên nijadperest ên li dewletên Qefkasê dihatin ajotin îro îflas kirine jî, ji ber ku rola Türkeş, di politikayên KT'ê yê derve de eşkere kir, xaleke girîng e.

Alpaslan Türkeş îro jî, serkeşiya têkiliyên Îsraîlê û Tirkîyeyê dike. Îsraîl, wek dewletek tecrûkîrî li Rojhilata Navîn, rûmeteke giran

dide têkiliyên bi Tirkîyê re. Tirkîye jî Îsraîl, di şerê qirêjî yê li hember gelên bindest de, mîna pispor dibîne û dixwaze ji vî mamosteyê şerê qirêjî sey bigire. Wezîrê Karê Derve -lawê xayîn- Hikmet Çetin, ji bo destpêka van danûstandinan amadekariya geştekir kir ku biçe Îsraîlê. Lê Îsraîl di wan rojan de li hember Ereban di qetliameke nû de bû. Herêma bakurê Lubnanê bi çekên giran dihatin kurtan û bi sedan mirovên sivil dihatin kuştin. Ji ber vî jî dewletên Erebe ji piya bûn û dixwestin êrişên Îsraîl rawestînin. Hikmet Çetin, ji ber tirsê dewletên Erebe, gešta xwe îptal kir û jî tixûbê Îsraîlê, ji Urînê vegeriya. Li ser vegera Hikmet Çetin, di rojnameyên Tirk de, bi rojan li ser "bêşexsiyetbûna politikayên KT'ê yê li hember dew-

letên cîran" hate guftûgokirin û nivîsin.

Lê têkiliyên pêvajoya nû rawestiyên û roja 9'ê Tebaxê generalek ji artêşa Îsraîlê hate Tirkîyê. Hevdiitînen General Bodinger û rayedarên KT'ê, ji çapemeniyê hatin veşartin û mijara hevdiitînan nehate diyarkirin. Lê li gorî ku, di çapemeniyê de cih digire, serdana General Bodinger, bi PKK'ê ve girêdayî ye û Tirkîye jî Îsraîlê, ji bo şerê li hember PKK'ê alîkarî dixwaze. Armanca yekemîn, bi balefirên Îsraîlê bombekirina kampên PKK'ê yê li Lubnanê ne. Çawa be Îsraîl her roj hedefên hêzên Erebe bombe dike; dikare di vî navê de, bargehên PKK'ê jî bombe bike.

Çawa ku diyar dibê Îsraîlê jî, ji bo alîkariyêke bi vî rengî amade ye. Lê, Îsraîl li hember vî alîkariya xwe ji Tirkîyê çî dixwaze (an jî girtiye) hê baş ne diyar e. Rojên li pêş, dê hemû xalên vî peymanê bi xwîn nivîsandî diyar bikin.

Reuterê beyanek weşand û biryara şandina masajên protestoyê ji bo hikûmeta Tirk kir.

Li Îzmîrê jî, ji bo protestokirina kuştina Ferhat Tepe û revandina Aysel Malkaç, kampanyayêke îmezeyê hate destpêkirin. Kampanya bi pêşkeşiya KMM'ê dimeşe. Îmezeyên ku tene berhevkirin, dê ji PEN'a navneteweyî re bîne şandin û desteka wan bê xwestin.

Heyetek ji rêxistinên demokratîk ên girseyî, û komeleyên jinan ku, li Almanyayê tevger dikin, hatin Stenbolê û li ser Aysel Malkaç lêkolîn kirin.

## Dewlet Ayselê vedişêre

noh-Weyer, bi beyaneke çapemeniyê, bang li hikûmeta Tirk kir û xwest ku Aysel Malkaç rojekê zûtir bê dîtîn. Beyana Angelîka Langenoh-Weyer, ji aliyê hin rêxistinên navneteweyî ve jî hate destekkirin. Rêxistinên ku îmze avêtine bin vî beyanê ev in: Edîth Bruckwilder (Rêkistineke cîhanî ya Dîns-lakê), Regîna Scheuerer (Endamê Kargêriya Mafên Mirovan a Duisburgê), Thea A. Struchte-

meier (Rexistina Terre Des Femmes'ê) Şengüle Şeno (Rêxistina Jinan a Navneteweyî ya li hember Zêrandina Zayendî û Nijadî).

Li aliyê din, komek jin û zorokên Kurd li Londonê, Navenda Ajansa Nûçeyan a Reuterê îşxal kirin. Ev livbazî, ji aliyê Yekîtiya Jinên Welatparêzên Kurdistanê (YJWK) ve hate organîzekirin. Li ser vî livbaziyê, livbazvanên Kurd, li navenda

# Ma Stenbol di hima zerya ma qandê welat erzeno

● *Tiya welatê ma nî yo. Çoşmê ma pêro xeribyê. Zulf û zorey tiyad jî est o. Ma îşportaci pêro zabita û polis ra aciz biye. Keyê ma, qeçekê ma tiya di nî yo. Ma pêro ze koxuşê hepsandê jiyenê 10-12 merdîm keyêyen di manenê û ma cay xwi re vane koxuş. Ma nê name qandê ca tengayê nêdayê. A nika cayê ma weş bo, hemû gurve ma ca di bo, ma do fina vajê ma koxuşan di jiyenê gorê nêkisê mi bifikiryê.*

Vernî ma şima nas bikerê?

- Namê mi Alî Biçak o, ez Sêwereg ra ya. 1987 di ameya Stenbol.

Şima qandê çi ameyê Stenbol?

- Welatê ma di gurve çin yo. Ma qandê debarê xwi ameyê, qeçekê ma est o, ma mecbûryê îna mird kerê. Ma welat di nêşayê debarê xwi bikerê, qandê na mesala ez ameya, Stenbol tiya di jî zehmetey bol o.

Qezencê şima qandê debarê şima bes o?

- Qezencê ma verî qîm nêkerdê. Ma bêçareyetî ameya tiya. Ez wexta vernî ameya tiya mi bol zehmetî vîna, wexta ma vernî yenê tiya karê çinîyo kes bikero. Karê kesî nêkerdê, yan nêşayê bikerê ê karî ma kerdê. Mesela sevlan boyax kerdê, hemaley kerdê, nê karê jî qezencê ci tayn û zehmetiya ci bol bî. Pery ma qîmê ma nekerdê, kireya banî ma nêşayê bidê. Dima welatanê Rojhilat di turîstî xwi ya qandê roten çî ardî, ma îna di tîkiley virastî û ma vernî meydanê Beyzid di çî rotê dima ma gurve kerd gird û kewtî bazar miyan.

Karê şima bolki serê bilye yo. Sebep ney çî yo?

- Ma vernî tebax û çiyê cîncîx rotê, qezencê nê karî hend

çinebî. Karê bilye qezencê ci bol o. Tiya Sêweregij, pêro nê karî kenê, tayn sermiyonê kesî bibo qezencê ci zaf weş o. Sebebo bîn jî no gurve, cefa ci tayn o, qezencê ci bol o.

Jiyanê şima tiya di senî o, zoreyeyê şima çî ye?

- Tiya welatê ma nî yo. Çoşmê ma pêro xeribyê. Zulf û zorey tiyad jî est o. Ma îşportaci pêro zabita û polis ra aciz biye. Keyê ma, qeçekê ma tiya di nî yo. Ma pêro ze koxuşê hepsandê jiyenê 10-12 merdîm keyêyen di manenê û ma cay xwi re vane koxuş. Ma nê name qandê ca tengayê nêdayê. A nika cayê ma weş bo, hemû gurve ma ca di bo, ma do fina vajê ma koxuşan di jiyenê gorê nêkisê mi bifikiryê.

Şima giredayî kamci sazî an jî komî ye û qandê çî semedî saz biyo û senî gurveyeno. Wexta persê şima beno şeno çareser kero?

- Bazarê ma giredayî Komê Îşportaciyan o. Bazarê ma di pêro endamê komî yo. Komê ma embazê tepîşyo yan jî çiyê ci, zabita arêdo qandê nê meseley saz biyo. Incax komê ma pasîf o, nêşeno heqê endamê xwi bigeyro an bigiro. Polis şeno îna jî bigiro. Kom hend şeno bac (vergî) bigiro û pery arêdo heta nika

bê nê karî komê ma çiyê nêşayo bikero?

Şima vat bacî arêdanê çî wext û çendi arêdanê?


- Serê dezgê ma meng 250 hezar danê beledî, meng 100 hezar ma ra heqê çopçî gîne. Malîyê jî her ser 3 milyon bac gîne.

No 3-4 meng beno ki Şubeyê Malî bazarê şima girot bî, çiyê şima şikîfî an jî dest ronay ser semed ney çî bî?

- Ma o wext zorbeyî, tengayî û heqaretê gird dî. Polis wexta yeno bazar miyan, zê verg bikevê vereka miyan. Çiyê ma pêro şikîfî, zerar bol day ma ro, qisey giranî kerdî vatê: "A nika namusê şima ujad bo, şima fina nêşenê ci bipawê" Semed nê zulmî ma zanê, senî nika welatê ma veran kenê, dewê ma bombe kenê, pîrê ma, qeçekê ma kişenê zulf û zorey kenê. Tiya jî parçê nê zulf yo. Ma tiya bolê ci Kurd ye, çoşmê ma herra yo, jutiya ma est o. Ma şenê pê miyan di qerar bigirê. Kisê ma jew o û ma rind perrey qezenc kenê. Ê jî nêwazenê ma tiya di bikewê herayê. Wazenê ma tim bindestî û hêşîr bê. Ma rê vanê hend pery şima seke nê, rişenê partî qandê nê meselî nêveredanê ma gurve xwi bikere. Ser finê dest dane çiyê ma ser û roşenê gumruk û gumruk jî fina malê ma roşeno ma.

Şima vat: "Ez rewnaya tiya di jiyena", keyê to tiya diro an niya. Persê şima senî vijyenê?

- Ez tiya di jiyana, hima keyê mi Sêwêrgo do û cinya mi jî ujado. Ez nêwazena biyara tiya, ez bi xwê qandê debarê xwi ameya tiya. Ez nêwazena tiya bijiya. Ez nêwazena we-



Alî Biçak: "Polis wexta yeno bazar miyan zê verg bikevê vereka miyan"

latê xwi terk bikera, keyê ma jî berê tiya welatê ma xirabê beno. Ez nêy nêwazena, tiya di tayn embazî keyê xwi anê ma îna di qisey nêkenê. No ma kerdo prensîbê.

Stenbol di saziyê Kirda estê, zê NÇM, DEP, Enstîtiya Kurdî, ûeb. Têkiliyê şima cîna di estê û şima xebatê îna senî vînenê?

- Ma her tim şinê saziyê xwi, tîkiliyê ma zaf est o. Saziyê ma wexto şew virazenê, ma tiya embazan aredanê şinê. Rojnamê ma tiya di zaf yeno rotîş û vendîş. Ma him wanêne him jî danê vendîş. Ma tiya di wazenê rojnameya xwi re bangê virazê. Wa tim bîrê tîkiley ma di virazê, wexta persê ma benê ma îna wazenê xwi hetek bivînenê.

Kurdistan di nika lejê beno, şima senî vînenê, çerey nê lejî çî yo?

- Ma xwi jî no lej miyan di vînenê. No lej, lejê ma yo. No lej, lejê neteweyî yo. Gowde ma lejî miyan di nî yo. Hima no lej fikrê ma di ro. Ez namê îşportaciyan şena vaja no mesela incax aştiya hel bo. Ma hezar ser yo Kurd û Tirk pê miyan di jiyenê. Ma nêwazenê pê bikşê. Incax dewlet nêwazeno ma piya jiyê tim fitne û fesadî ma maben virazeno. Wazeno Kird û Tirk pê bikşê.

Ez wazena mesela zuwan ser o jî vîndera. Qandê zuwanê ma rind bo, fikrê şima di çî est o?

- Qandê zuwanê ma rind

bo ez şena vaja, ma zuwane xwi ya qisey bikerê. Qandê ma zuwan xwi vîrî nêkerê û nika rojname û govarê ma est ê. Verî wexta newe vijiya ma çiyê fam nêkerdê, ma rê zaf giran ameyê. Dima 3-4 finî kes buwano pa hîne zuwan beno. La belê tenya rojname û govar qandê zuwan musnayış tayno. Ma wazenê mektebê ma abiyê, ma şîrê zuwanê xwi ya biwanê, binivîsno, tim zerya ma di ro.

Ma şima jî nas bikerê, namê şima çiyê, şima kotî ra ye û çend ser yo şima ameyê tiya tengay şima estê?

- Name min Abbas Yolveren o, ez Wêranşar raya û 3. seryo Stenbol di ra. Ez jî zê embazê Garîp bêçareyetî di ez ameya tiya. 5 qeçek min est ê, pêro welat dê. Ez vîra cîna kena, vîra welat xwi kena. Tiya xeribe yo, hêşîre yo. Hima ez mecbura pîze qeçekê xwi mirdî bikera. Qandê ney ma tiya di ser 5-7 meng gurveyenê û tayn pery arêdanê dima fina şinê welatê xwi.

Min Embazê Garîp pers kerde. Hima ez wazena fikrê şima zî bigira. Şima se van ê, no lej senî çereser bo?

- Ez wazena no lej, rojê ravey biqedyo. Me hezar serî yo Kird û Tirk pê miyan di jiyenê. Qeçekê ma, merdimê ma jî şinê eskerey. Ma jî, wayîrê nê welatî ye. La belê a nika dewlet dewên ma bombe kenê, ma surgun kenê. Çarey ma bê lej nemendo.

Reportaj: Sevinç Özipek



Stenbol di komê îşportaciyan weynê dê yeno vînayiş

**Neşan**Her mirovek, bivê nevé lehengê  
(qehremanê) çîroka jiyana xwe ye.

John Barth

Nivîskarê Amerîkî (1930- ...)

# Cehşikên çarpê û dupê

*Di wêneyê de cehşikên çarpê û dupê bi hev re diçêrin.*

Ker, di nav alema dewaran de, bi bêaqilî û belengazî tê naskirin. Çiqas barê giran lê bibe deng nake, heta karibe diçe. Tu berê wî bi kîjan aliyê ve bidî, bi wî aliyê ve diçe. Doza xwarinê û vexwarinê nake, çî dibîne dixwe, tunebe naxwaze. Li ku bê girêdan li wir disekine, xwe tev nade. Ji êşê re qelew e, bi lêdanê naêşe. Ji xwediyê xwe re sadiq e, bêemriya wî nake. Bêfedî ye, bihara li ser bendera dizirre û li pey cinsên din digere. Ji tu tiştî natirse, bêxof e, bêaqil e, belengaz e...

Cehşik (dehşik), ku çêlikê kerê ye, ji diya xwe jî kurtir e. Ew tecrûbeya jiyane jî jê re nîn e. Û ji cinsê xwe re jî ne tu war e.

Çêlika kerê, ku radibe ser piya û dest bi meşê dike, dibe cehşik. Kar û barê wî/wê listik û gerr e. Heta birçî nebe, naçe ba diya xwe. Bi cinsê xwe re nagere, naçe ba wan. Ew her dem li ser benderan li ba golik, kûçik û berxikan e. Lê ew jî, ji cehşikê aciz in, jê hez nakin, lêdidin, wê (wî) gez dikin, zîtika davêjinê. Lê ew dîsa naçe ba cinsên xwe. Heta zikê wî (wê) birçî nebe, naçe ba diya xwe. Piştî şîr vedixwe û xwe têr dike, dîsa diçe ba golik, kûçik û berxikan û dest bi xwarina lêdanê dike.

Di pirtûka muqeddes Qur'ana Kerîm de; ji bo keran, "Inne enqere el eswatî le sewte el hemîrî" tê gotin. Ev gotin tê ve maneyê: "Dengê kerê ji hemû dangan xerabtir e." Li gora ola

îslamê tu qîmeta keran nîn e. Di nav pîrr gelan de jî, ji mirovên bêaqil re, "ker" tê gotin.

## Cehşikên dupê

Mirovên Kurd, di jiyana xwe de pîrr bi xwezayê (tebîatê) ve girêdayî ne, insanên çiya û zozanan wek darekî, bi axê û avê ve girêdayî ne. Ji ber vê yekê, tiştê tê serê wan li gorî çavdêriya xwe ya li xwezayê dinirxînin û wisa bi nav dikin.

Di dîroka wan de, gava şerê neteweyî dest pê kir, wek şoreşger û neteweperweran, xinizan (xayînan) jî rûçikên xwe nişan dan. Şoreşger xwe li çiyayan girtin, dest bi şer kirin. xinizan jî, xwe dan kêleka neyaran û li dijî qewmê xwe şer kirin.

Di dîroka Kurdan a nûjen (modern) de îxanet, bi destpêkirina avabûna rêxistinên neteweyî re derdikeve holê. Henga ku xayînan rabûn, neteweperweran jî, navek li wan danîn; ev nav cehş bû. Cehş ne di maneya xîzî (xayînan) de tê bikaranîn. Xayînan; ew kes in ku ji gaziye direvin an jî di nav gazî û şer de bi dijmin re bi awayekî dizî dikevin tîkiliyê û alîkariya dijmin dikin. Yanî, bi awayekî dikeve nav şer, lê dawiyê îxanetê dike.

Cehş ne wisan in. Ev nav, dema tevgera neteweyî li Kurdistanê Başûr dest pê kir, li wan hat danîn. Eşîrên cehş, dema ku tevgera neteweyî dest pê dike, ji bo peran û ji tirsan, xwe dispêrin rejîmê.

Wek cehşikên kerê, ji dayîka

xwe ya niştiman dîr dikevin. Diçin ba neyar, li wir bêşeref, bêheysiyet, bi lêdan, bi êş û bi minet dijîn. Lê gava ku xulamtiya wan diqede, dîsa çermê stûyê xwe dixurînin û tînan ba qewmê xwe.

Kurd, di nav hemû miletan de yek ji yên herî bêsiûd û bextreş e. Belavkirina axa wan li aliyekî, ew bi xwe jî belav bûne. Aqil û jîrbûna wan, ji hev dîr ketiye. Çî bêbextî hatiye serê wan, ji xiniz û cehşikên dupê bûye. Lewma, gotina, "Kurmê darê ji darê ye" ketiye zimanê wan. Ji ber ku wan jî ev rastî di tiye, li xwezayê nihêrtine û ew mirovên xwe yên neyarên qewmê xwe, bi navê tîjkên kerê nasandine. Li Başûr, piştî şerê 1961'an, bi Soranî gotina, "Le tirsan û le bîrsan Kurd hemû bûne fîrsan" belav bû. Rejîma Bexdayê, navê cehşikên xwe bi Erebi danîbû fîrsan, ku mana wê, "cesûr, suwarî" bû. Bi vî navî dixwest ku şeref bide wan. Ji ber wê yekê, li Kurdistanê Başûr, dema cehşikê rejîmê li kuçan derbas dibûn, zarokan wek ku gazî keran bikin, digotin, "Kurç, kurç" û gazî wan dikirin, an jî ceh diavêtin ber wan. cehşikên dupê li Bakur jî, wek pasevanê (nobetdarê)-kûçikê ber derê rejîmê, wek "qorici" tînan bi navkirin.

Di wêneyê de; li welatê Serhedê cehşikê dupê û çarpê, bi hev re diçêrin.

**Seyîr Çiya****TÎR****Musa Anter**

## Apê Musa

Ziyaretgah bû welat ji bo we  
Dafikên zexel danîn ji bo we  
Xwîna sor da bûn xelat ji bo we  
Hevkarên bêbext bo Apê Musa

Çêkir li roja bîstê Îlonê  
Dîrok neh sed û not û diduyan de  
Birin ser dafan li Seyrantepe  
Belê namire Apê me Musa

Geşt û seyran kir paytexta welat  
Evîndar rengên bilbil ji bo gul  
Xwînmij û hêkar bo wî nêçîrvan  
Xistin dafikan Apê me Musa

Hiştin li nav zor cerg û xwînan  
Jara xwîna wî deng daye cîhan  
Heft roj şînî ye gelê Kurdistan  
Reş girê dan bo Apê xwe Musa

Me mil da Apo li Kurdistanê  
Her dem li milên keç û lawan e  
Natefe tu dem şewq li cîhanê  
Bo rewşenbîriya Apê me Musa

Niv esrî derbas kir pênûsa rengin  
Bo biratiya gelan da îlham  
Dîrok û jîrî helbest û meqam  
Tu dem bîr nakin Apê xwe Musa

Tiştên we daye Kurd û Kurdistan  
Mamora we pesind li cîhan  
Bi ras hûn ûn bo gelan rêzan  
Tu dem berê re Apê me Musa

Çanda Musa we ya demokrat  
Xwîna we qutsî li xak û ser qad  
Karker û gundî zebal û erxat  
Tevî sond xwarin bi heyfa Apo

Xwînmijên xadar di gel hevkaran  
Amade kir daf bi kar û baran  
Hezaran tif ser riyên hevkaran  
Bizanin namire Apê me Musa

Perda serçavên hevkar dê rabe  
Dadgeha gel ew dê bi dad be  
Dadger û dozger bidin biryarek  
Biryara xwîna Apê xwe Musa

We tenê heştî Kurd û Kurdistan  
Bûne rûwengî li nava karwan  
Karwanên şehîd karker û gundî  
Tevî li we ne Apê me Musa

Ji bo wan hûn dibine mêvan  
Li cem Şêx Seîd, neviyên Bedirxan  
Doktor Fuat û di gel gernasanan  
Mêvanek ezîz Apê me Musa

Elîşêr di gel Seyîr Rîza jî  
Xalîr Beg di gel Qadî Mihemed  
Îhsan Nûrî û di gel Berzanî  
Xwenga Leyla jî, Apê me Musa

Kekê Qasemlo û heval Wedat  
Hafîz û Huseyn û rojnamevan  
Xwezî ji bo we, bo wan mêvanî  
Hûn ku nemir in, Apê me Musa

Şoreşvan bûn hûn, bi pênûsa xwe  
Xweş rêzan bûn hûn, şîrîn peyvên xwe  
Çira bûn hûn bo Kurdistanê xwe  
Nemir e Apo, Apê me Musa

Çavên we vekirî nemîne Apo  
Demên xweş bo me nêzik in Apo  
Nabin xemgîn em li hempa xwînmij  
Bêxem hûn razên Apê me Musa

Bawer im ez, hûn bê xem bin li wê  
Lewre we gihîstand gelek keç û law  
Dimeşin her dem li ser şopa we  
Sîpan di gel wan Apê me Musa

**Sîpan Xizan**

Di ronahiya 15'ê Tebaxê de li Melazgir, Dîgor û Gîhadînê meşa rizgariyê û livbaziyan gerîla

# Serhedê serî rakir

**Agirî, Welat-** Ji bo rizgarî û serfiraziyê ku têkoşer û şehîd pîr bin, lê li welatekî bindest, hemû însan bi biçûk û mezinan piştî bidin têkoşinê

Çiya û banîyê welat giş bi xwîna têkoşerên wî hatibe avdan

Tîrsê cihên xwe dabe mîrxasiyê, bindestiyê cihên xwe dabe serfiraziyê

Xwestina rizgariyê bandorî li ser mirin û bindestiyê kiribe

Hûn bizanît ew dem

Gul û sosinan, hêviyê dê serê

xwe di bin berf û bahozê de rakin

Û silav li şervan û şehîdan bikin

Ew dem berf û bahoz, agir û kambaxî dê bi xwe, bi xwe

bihêlin

Li ber çavên me yek bi yek

Em dê bigihîjine evîna xwe û Kurdistan xwe...

Ji ber daxwaz û fermana ERNK û Çardehê Tebaxê li Dîgorê meşeke mezin pêk hat û ji çar hezarî zêdetir mirov beşdarî vê meşê ya rizgariyê bû. Ji der dorê Dîgorê zêdeyî çil gund bi tiraktorên xwe beşdarî vê meşê bûn, bi dirûşme û geşiyê mezin ve ber bi navçeya Dîgorê meşiyên. Hêzên KT'ê hemû cûyîn û hatinên riyên navçeyê girtibûn û bi hezaran tîm, jendirme, polis li ser rîya Çildirê dest bi qetbirra xwe ya neheq kirin. Dîsa bi dehan şehîd û bi sedan birîndar û girtî... Piştî vê bûyerê Serhed dîsa dibe şahidê bûyereke nû, ev bûyer ji li Melazgirê diqewime. Gelê navçeya gundên Melazgirê li hev kom dibin û dixwazin ji bo biratî û ji bo dawîya kuştin û qet-

birran bimeşin. Armanca wan kuştina hêzên KT'ê nîn bû, armanca wan, xwestina hinek mafên mirovahî bû. Di Panzdehê Tebaxê de bi traktorên xwe û bi otobûsên xwe ve, li gundê Dolabaşê kom dibin, paşê tene gundê Melebaqî, li wir tiraktorên xwe û otobûsên xwe datînin û ji hev re dipeyvîn. Daxwazî û armancên xwe diyar dikin; armanc, hatina Melazgirê ye. Dema nêzikî Melazgirê dibin, ji Melazgirê du kilometre dûr li ser çemê Badîsanê bi hezaran hêzên KT'ê bi tanç û top çeper li der dorê vê civata meşdar digirin û wan dixine nava agirê xwe. Yê ku beşdarî vê meşa han bûbûn, şeş hezar însan bûn. Di nav van meşvanan de zar, keç, bûk, kal û pîr û hwd. hebûn. Lê kalekî şêst salî der heqê qetbirra KT'ê de wiha digot: "Demê me nêzikî li navçeyê kir, hêzên zaliman bi panzêran ve der dorê me girt û ji me re: "Zêde nemeşin, di cihên xwe de bisekinin û li erdê bimelin, ku hûn wek gotina me bikin tiştek bi we nayê" gotin. Me jî wek gotina wan kir û em di cihên xwe de sekinîn, paşê wan bi panzer û tîfingangulle li me reşandin. Em di nava agirê wan de bêcare man û me bi zor xwe avête çemê Badîsanê. Lêvên çem wek sê metroyan bilind bû û bi zar û keçan ve, bi hinek kal û pîran ve me xwe avête çem û em di wir de di nav avê de qederekî roda çûn. Wan ji me re digot: "Sol û goreyên xwe ji xwe bixin" me sol û goreyên xwe kir û wan em di na-

va avê de wisa birin û anîn û paşê jî em giş li wê derê li ser zik dane vezelandin. Her wekî em di işkençeyê de derbas kirin. Dilê wan bi tu kesî neşewitî, qedera sî tiraktorî perçiqandin û ji holê dane rakirin. Paşê di nav me de xwediyên tiraktorên giş girtin û birin. Xincî wî ji du sedî zêdetir mirovên din jî kirin bin çav û ew jî hildan birin. Ez bi vê kalîtiya xwe jî terefê fîman ve pîr hatime hencirandin."

Ên ku beşdarî meşê bûbûn ku çawa digotin KT'ê teroreke pîr mezin li ser mirovên welatparêz domandibû, hemû nexweşxane tişte birîndar û kuştî bûbûn. Lê bûyerên Melazgirê wek şeş hezar însan, gundê Dîgorê wek çar hezar însan bêyî bandor ji bo rizgariya Kurdistanê dimeşin û piştgiyê mezin didin eniya Kurdistanê. Beşdariyên meşê digotin: "Bîrbaşî wek tolazekî bang dikir." Ma hûn çima dimeşin, ku min bihata ji we re bigota werin li aliyê me bigirin yek we nedihat, pekî hûn çima ji bo vê partiya terorîst wiha bi pîranî dimeşin? Kî ji we re got bimeşin? Di van serhildanên han de dîsa şehîd çêbûn û girtî pîr bûn, lê tu kes natirse û ev rewş xwe di rûçikên gundîyan de dida xuyakirin." Digotin: "Ma qey emê ji çî bitirsîn, wele ne mal û ne hal tu tiştê li ber çavên me nayê, em tenê rizgarbûna Kurdistanê dixwazin."

15'ê Tebaxê li Kurdistanê bi gemaşî û egîdî hate pîroz kirin, ev bûyer xwe bi hêsanî di livbaziyan

PKK'ê û meşên gel de, da diyar kirin. Çawa ku di bin serokatiya Mahsun Korkmaz (Agît) de, êrişeke nemir hat pêkanîn û damezîrandina partiyê bi livbaziyan xwe ve, di cihê herî qehîm de hate rûniştandin, li Serhedê û li hemû derên Kurdistanê jî bi livbazî û bi meşên mezin ve ew rih û mezinahiya "15'ê Tebaxa 1984" hate afirandin û jiyandin.

## ŞEHÎDÊN 15'Ê TEBAXÊ GIŞ KEÇ û ZAROK BÛN

Li ber van zilm û zordariyan han, çavên mirovan tişte hêşir dibin, lê ji destê mirovan tu tiştek nayê, ango dema derketina serê çiyên e. Lê ez jî li gorî xwe de têkoşinê didim. Agirê dilê xwe û birîna xwe bi hinek helbestan ve binim ziman. Dema di meşa Dîgorê de wek panzdeh mirovan şehîd ketibûn, ji van çend kes jî keçên dest bi hine bûn. Li gundê Neşîwanê Zeyneb, Selvî, Gulîstan û hwd. şehîd ketibûn, wan di dilê min de birîneke bêderman dan çekirinê, gelek xort û lehengên me yê hêja bi hovîtiya KT'ê jiyana xwe wînda kirin. Di vê meşê de destê biratiyê bi hovîti hat şikandin û jê kirin. Li gundên Melazgirê Nordîn, Kîranlix, Dugnuk, Hasûn, Piramasiya, Alyar, Dolabaş, Gomik, Hesenpaşa, Kanîkûrk, Qereşeye, Bostankaya, Mezra, Toza, Melebaqî û hwd. ji bo rizgariya xwe hemû mal û hebûna xwe feda kirin. Çawa tê gotin KT'ê (TC) du sed tiraktor perçiqandiye û gelek zirar gihandiye gelê gundîyan. Lê tiştê herî me-

zin ew e ku li Hekariyê diqewime. Pêwist e ku hemû gerdûn lê şahid be. Panzerên KT'ê di kolanên Hekariyê de zarokê perçiqand, navê zarokê Nasrullah Sevîm e. Zarok ew roj ji xwe re dileyîst, ji hemû nerindîyan dûr, lê tîmên devbixwînan bi panzeran ve bi zanefî pêpeşî ser kirin û zarok di bin panzerê de can da. Ango li ber bûyerên han mirov carinan dikeve rewşeke nerind û kambax, lê carina helbest tene piştgiriya mirov û mirov demeke kin be jî, wan rewşên nerind dikare bîr bike. Her wekî di Kurdistanê de şerekî dijwar didome û pêwist e ku em gorî vî şerî xwe biparêzin û têkoşinê bikin. Lê tu car netirsîn, her tiştek bedelekî wî heye, bedelê rizgariyê jî mirin e, ma em qey ji bo neyar hindik mirin, li Çanaqaleyê, li Qibrîsê, li Qoreyê û li Kurdistanê... Îro jî pêwist e ku em ji bo xwe hinekî bimirin. Serhed hêdî hêdî xwe amadeyî şerê çekdariyê dike û hêzên xwe di vê helê de xurt dike, ji bo tola Geliyê Zilan, Serhildana Agirî û hwd.

Ez di vê helbestê de axîna zarîna zarokên Kurdistanê yê bêkes û bêcare dixwazim binime ziman. Hemû xort û keçên Kurdistanê li serê çiyên û banîyan çî armanc dikin û Kurdistanê çawa dixwazin, der heqê wê de dixwazim wê helbesta xwe pêşkêşî şehîd û şoreşvan bikim. Wek keser û kewa dilên min wiha çareser bibe.

Kulîlkên zivistanê ne em  
Kulîlkên ber bayê sira sibehê  
Kulîlkên rizgariyê ne em  
Kulîlkên li ber kelîndiya zilmê  
Kulîlkên bêbilbil in em  
Û bêevînan in em li ber bêhna  
Kurdistanê

Kulîlkên xerîbiyê ne em  
Ew zozanên ku em naçinê  
Em kulîlkên evîna çiyên in  
Ji bo rizgariya xwe yek bi yek...

## LI GÎHADÎNÊ POZBERÎ

Li navçeya Agiriyê li Gîhadînê li cihên çiyayî de, di navbera hêzên dewletê û gerîlayên ARGK'ê de pozberiyê dijwar pêk hat û di vî şerî de şeş gerîla şehîd ketin, tîmek û sivilek hat kuştin, gelek jî leşker hatin birîndarkirin.

Li Gîhadînê di salvegera 15'ê Tebaxê ya nehemîn de piştî livbaziya kepenk girtinê, li gundê der dorê Gîhadînê bi qasî hezar mirovî li hev civiyan û ber bi navçeyê dest bi amadekariya meşê bikirana, ji bo ewlekariya girseyî li devera çiyayên Gûnbuldu-Kurdîkoyê ew gerîlayên ku li hêviya girseyê gel bûn, di navbera wan û hêzên dewletê de pozberî derket. Şer heta nava gundê Kurdîkoyê dewam kir, li wir yek jin û

## 'Dewlet berpirsiyarê vê qetlîamê ye'

**Navenda Nûçeyan-** Heyetek ji DEP'ê, li ser qetlîama Dîgorê ku hêzên dewletê di 15'ê Tebaxê de meşvanên ji 12 gundan gullebaran kiribûn, li navenda navçeyê û li gundên wê lêkolînan pêk anîn. Bi heyeta DEP'ê re endamên çapemeniya Tirkîyeyê û biyanî jî hebûn. Heyet ji bo rastiyê derxin holê, bi gel û rayedarên dewletê re hevdi-tînan pêk anîn.

Li ser navê heyetê mebûsê DEP'ê ye Şîrnexê Mahmut Alinak beyanek da. Alinak daxuyand ku li ser vê qetlîamê, bi sedan kesî re hevdîtin pêk anîne û de raporeke berfireh li ser vê bûyera ku 16 kes hatine kuştin û 144 kes jî birîndar bûne amade bikin.

Mahmut Alinak di kurtebeyana xwe de ev agahdarî dan: "Meşa ku ji gundan ber bi navenda navçeyê ve pêk hatîye bi daxwaza PKK'ê bûye. Li dijî beyanên fermî, ji koma meşvanan tu kesî bi ser hêzên dewletê ve gulle neteqandiye. Dîsa li dijî beyanên fermî hejmara kuştîyan ên ku me heta niha tesbît kirine 16, yê birîndaran jî 144 ne. Gelek ji birîndaran jî, ji tîrsa ku dê bêne binçavkirin, neçûne nexweşxaneyan. Di

navbera hêzên dewletê û PKK'ê de tu ser neqewimîye. Tîmên taybetî, yekalî gel gullebaran kirine. Bi saya qeymeqamê Dîgorê, ev qetlîam berfireh nebûye." Mahmut Alinak diyar kir ku hin ji birîndaran, li dû panzêran hatine kişandin. Alinak axaftina xwe wiha domand: "Waliyê bajêr, bi temamî li derveyî vê meseleyê hatiye girtin. Agahdariya Emniyetê jî ve meşê hebûye, lê ji walî re tu tişt negotîne. Ger di navbera herdu hêzan de şer derketibûya, divê ji PKK'ê û ji hêzên dewletê kuştî hebûna. Lê tiştekî wiha nîn e."

Alinak gote ku, de raporeke berfireh amade bikin. Alinak bi ber dewamî: "Ger tê xwestin ku xwîn û hêstîrên çavan rawestin, divê terora dewletê ya li hember daxwazên însanî rawestin. Lewre kana ve kabûsê terora dewletê ye û kirinên dewletê yê li dijî demokrasî û mirovahiyê ne."

Li aliyê din rêxistina SHP'ê ya Qersê, qetlîama hêzên dewletê ya ku li Dîgorê pêk anîn protesto kir.

Li gor ku heyeta DEP'ê tesbît kiriye, navên kuştî û birîndaran ev in:

**GUNDÊ NEXŞIVAN:** Şêniya vî gundî

4 hezar e. Ji vî gundî 3 keç û 2 law ku temenê wan li navbera 12 û 18 ye hatine kuştin, 55 kes jî birîndar bûne. Navên kuştîyan ew in: Hasan Çağdavul, Zeynep Çağdavul, Gulîstan Çağdavul, S.Ç (16) û Giyasettîn Çalişici. Ji van kesan 2 kes bi birîndarî hatine girtin û li dû panzêran hatine kaşkirin û mirine.

**GUNDÊ ZIBÎNÎ:** Şêniya vî gundî 1200 e. Ji vî gundî 5 keç ku temenê wan di navbera 14-18 de ne, li dû panzêran hatine kaşkirin û kuştin. Navên wan ew in: Z.B (12), Yeter Karancılar (13), Necla Geçener (14), Sona Çiğdemalp (18) û yeka ku navê wê nehatiye tesbît kirin, temenê wê li dora 60'an e.

**GUNDÊ ZIXÇÎ:** Ji vî gundî Nurettîn Orun (51) û Süleyman Taş hatine kuştin.


**GUNDÊ KIZILKÛLE:** Ji vî gundî Cemil Özbarış (40) hatiye kuştin.

**GUNDÊ TILIK:** Ji vî gundî Asiye Barlak hatiye kuştin, 15 kes jî birîndar in.

**GUNDÊ BACAL:** Erdal Boğan hatiye kuştin, 3 kes jî birîndar in.

**GUNDÊ BAŞKAY:** Mirovek ku navê wî nayê zanîn hatiye kuştin.





*Li Stenbolê li Taxa Sultançiftliği, 15'ê Tebaxê bi meşeke gur û geş hate pîrozkirin.*

pênc gerîla şehîd ket, tîmek û gundiyeke hat kuştin û gelek jî leşker hate birîndarkirin. Ew leşkerên ku ji bo hinceta lêgerîna hundirên malan hatin, ketine gund û gund hildane ablûkayê, anîn malek bi panzeran burşandin û İsmet Kuşçu dane ber gullebaranê, paşê kamyona wî ya BMC şewitandin. Dû re hemû gundiyan li meydana gund dane civandin di bin lêdanê de derbas kirin. Çawa ku tê beyankirin di navçeyê de rewşeke ne xweş bandoriya xwe dide berdewamkirin. Navê tîmê taybetî: Coşkun Kaya, navê gerîlayên şehîdketî: Yaşar Güngör, Seyad Degirmenci.

#### LI TATOSÊ BİNÇAVÎ

Ji bo damezirandina salvegera nehemîn ya 15'ê Tebaxê li Erzeromê li navçeya Tekmanê ji deh gundî wek hezar mirovî girseyek meşiya. Li ser girtin û xitimandina riyên navçeyê ya dewletê pêkanî bû, girse ji navçeyê 20 km dûr li hîndera Pira Çevirme bi def û zîme 15'ê Tebaxê pîroz kirin. Piştî van bûyeran hêzên dewletê êrîşeke mezîn bire ser girseya giran û bela kir, ji beşdarîran wek sîh mirov kirin bin çavan.

Ji gundên der dorê navçeya Erzeromê li Tatosê (Tekmanê) wek hezar mirov girseyek giran, ji bo pîrozkirina salvegera damezirandina 15'ê Tebaxê û ji bo lanetkirina qetbîr û neheqîyan meşeke heja pêk anîn. Li ser girtin û xitimandina riyên navçeyê, girseyê ji navçeyê 20 km dûr li hîndera (tenga) Pira Çevirme cejneke mezîn pêk anîn. Li vir hinekan peyvên der heqê zîlm û kotekiya dewletê ya ku li Kurdistanê pêk tê kirin. Li ser vî bûyerê hêzên dewletê bi êrîşeke mezîn ev civat da belavkirin û gelek kes kirin bin çav. Ev kesên di bin çav de ne yek jê Serokê Partiya DEP'ê ya navçeyê Nîmetullah Aksan e.

#### MEKÎNEYÊN KAR ÊN YSE'Ê HATIN ŞEWITANDIN

Gundê Darebiyê (Yoldüzü) ku niha girêdayî Agiriyê ye, li nêzîkî gund tesisên îstasyona lêgerîna

yan YSE'ê ji aliyên gerîlayên ARGK'ê ve hate şewitandin. 4 mekîneyên kar ên YSE'ê ketine rewşeke xerab û hatine îmhakirin.

Di 10.8.93'yan de saet 23.00'ê êvarê li gundê Darebiyê gerîlayên ARGK'ê êrîşeke mezîn bire ser dem û dezgehên YSE'ê, 4 tiraktor û makîneyên kar şewitandin. Keynî vî êrîşê gerîlayên ARGK'ê bi roketavê û çekên otomatîk ve êrîşeke mezîn birine ser lojmanê YSE'ê û lojman dehibandin, çawa tê gotin lojman xesareke mezîn dîtiye. Wek gotina gundiyan ew tiraktor û mekîneyên kar ên YSE'ê ku hatine şewitandin di hînderên 4 hezar donim erazî de dixebitîn.

#### JI BO QETBIRAN LI MÛŞÊ KEPENG HATIN GIRTIN

Li navçeya Mûşê Melazgirê, ji bo qirkirina dewletê ya ku di 15'ê Tebaxê bi êrîşa girseyeke mezîn li gundên Dîgorê pêk hatibû, hat protestokirin. Ji bo wê di navçeyê de hemû esnafan kepengên xwe girtin û ev bûyer protesto kirin. Hêzên dewletê ew esnafên ku kepengên xwe girtine, êrîşeke mezîn bire ser dîkanên wan û dîkanê wan texprîp kirin.

Hêzên ku dîkan texprîp kirin ji cendirmeyên qeroqola navçeyê, leşker û polîsan ve pêk hat. Ew kesên ku kepengên xwe girtibûn dewletê bi zorê ew kesên di malê wan derxistin û pê dîkan dane vekirin û ew kesê ku ew bûyer qebûl nekirin ji terefê hêzên dewletê ve hatine binçavkirin. Gorî gundî û çavkaniyên derdorê navçeyê, wakiyateke mezîn li wan deran tê kirin.

#### STENBOL

Li Stenbolê, 15'ê Tebaxê li hin tengan bi xwepêşandan hate pîrozkirin. Li Taxa Sultançiftliği, li dor 1000 însanî bi tilîliyan û pankartên ku li serê "15'ê Tebaxê ji hemû gelan re pîroz be." nivîsibûn, meşiyên.

Meşvan bi posterên Abdullah Öcalan, Mazlum Dogan û Mahsum Korkmaz ve dirûşmeyên "Kurdistan wê ji faşîzmê re bibe

goristan.", "Bijî PKK, Bijî Serok Apo" meşiyên, jendîrme û hêzên dewletê gulle li gel reşandin. Dema gel bi kevîran dan ser hêzên dewletê, wê hengê xwe dan alî. Polîs li Bağcılar jî gulle li gel reşand. Li Îkitelli jî 2000 kes meşiyên.

Di vî navê de karkerên BMO li Çekmece ji bo protestokirina dewletê û pîroziya 15'ê Tebaxê rojekê dev ji karê xwe berdand.

#### ENQERE

Li Enqereyê nêzîkî 50 kes bi meşeke korsan 15'ê Tebaxê pîrozbahî kirin. Di vî meşê de dirûşmeyên "Bijî PKK, Bijî Serok Apo, Kurdistan wê ji faşîzmê re bibe goristan" hatin avêtin.

#### ERZEROM

Ji bo pîrozbahîya 15'ê Tebaxê gelê 11 gundên ku li ser navçeya Tatos (Tekman) a Erzeromê ne, zêdeyî 1000 kesî li gundê Küllük gihîştin hev û bi def û zîmeyê pîrozbahiyê pêk anîn. Piştî vî leşkerên navçeyên der û dor bi ser gel ve çûn 16 kesên xistin bin çav.

Li Dêrsimê jî li navçeya Mêzgirê (Mazgirt) 3 roj kepeng hatin girtin.

#### Li welêt û derî welêt pîrozbahiyên 15'ê Tebaxê

Salvegera nehemîn a 15'ê Tebaxê keynî Kurdistan û Tirkiyê, li Moskovê, Ermenîstanê û Fransayê jî bi meş û şahîyan ve hate pîrozkirin. Her wiha li Stenbolê, Edenê, İzmirê jî meş li dar ketin, lê li van herêman jî weke li Dîgorê û Melezgîrê şahîyên gel ji aliyê hêzên dewletê ve bi gullereşandinê hatin bersivandin. Li Kurdistanê gelek navçe û bajarok ev helwesta dewletê bi kepenggirtinan protesto kirin.

#### KAZAKÎSTAN-ER-MENÎSTAN-MOSKOV-PARÎS

Li gor nûçeyên ku me ji KURD-HA'yê girtine Kurdên ku li Ermenîstan û Moskovê dijin, salvegera nehemîn a 15'ê Tebaxê ku destpêka şerê çekdarî yê rizgariya gelê Kurd e û bi pêşengiya Partiya Karkerên Kur-

## Nûçeyên cengê

**14 Tebax 1993:** Di dema operasyonên dewletê ku li Cûlemêrgê û navçeyên wê pêk dianî de, gerîlayên ARGK'ê êrîş birin ser avahiyên dewletê yên ku li navenda Cûlemêrgê û navçeya wê Geverê (Yüksekova) ne. Avahî xesar dîtin û şebekeya elektrîkê rûxandin. Gel kepengan girtin û dermeketin der.

Dewletê piştî cerda gerîla ya ku li ser Tabûra Deştanê, pêk anîbû û bi vir ve, çûn û hatina navçeya Çelê (Çukurca) qedexe kiriyê.

Gerîla li Wanê û Mêrdînê avêtin ser gundên cerdevanan, li Martiniz (Kangal) ku li ser navçeya Şaxê (Çatak) ya Wanê ye leşkerek û cerdevanek mirin û 3 jî birîndar bûn.

Gerîla 3 kepçe û 4 qemyonên ku qîrê dirijînin û depoya mazotê şewitandin. Ev makîne ji bo avakirin bendavê ku li Malabadê (Di navbera Farqîn û Batmanê de ye) bê çekirin dihatin xe-bitinandin.

Li Wanê Taxa Xaçortê kesek bi navê Mehmet Dilavar ji aliyê ARGK'ê ve bi mebesta xayîntiyê hate kuştin.

**15 Tebax 1993:** Operasyonên hêzên dewletê li dorhêlên Cûlemêrgê û navçeyên wê xurt dibin. Bi taybetî jî li herêma Oramar, Çelê, Navşan û Geverê şerê germ xwe dide der. Li Cûlemêrgê navenda bajêr, bêtelekîrîk e û hemû esnafan kepeng daxistine, şofêran jî kontak radane.

Li Elbîstanê cerdevanan li hêla çiyayên Engîzekê cihên gerîlayan tesbît dikin û hêzên dewletê pê agahdar dikin. Bi vî awayî 7 gerîla hatin kuştin.

Li Erzînganê li gundê "Yaylabashi" gerîla û leşker li hev xistin, çawişek û gundiyeke hatin kuştin. Li Gîhadînê gerîla û cerdevan li hev xistin, cerdevan Mustafa Kaya û Makbule Kaya hatin kuştin.

Gundê Ferhendê ku li ser navçeya Farqînê ya Amedê ye, cara duyemîn ji aliyê hêzên dewletê ve hat şewitandin.

**16 Tebax 1993:** Li Gîhadîna Agirî di nav şerê gerîla û hêzên dewletê de 5 gerîla û tîmekî taybetî hatin kuştin. Li Gîhadînê piştî girtina kepengan, li seriya hezar mirovî ji bo pîrozbahîya 15'ê Tebaxê ber bi navenda bajêr ve dimeşin, gerîla ji bo girseya gel biparêze, di amadekariyê de ne; di vî navê de ew û hêzên dewletê rastî hev dibin û şer dest pê dike. Bi vî awayî pênc gerîla tîn kuştin. Du gerîla bi navên xwe Yaşar Güngör (Eğit) û Seyyat Degirmenci ne, tîm jî Coşkun Kaya ye.

Li Geverê (Yüksekova) piştî ku gerîla bi êrîşekê qereqola cendirmeyan, Midûriya Ewlekariyê û şubeya leşkeriyê dan ber gulleyan û xesirandin, hêzên dewletê bi panzeran li navçeyê gulle reşandin, beşkekî mir 40 kes jî birîndar bûn.

**17 Tebax 1993:** Gerîla li Wanê cerdî ser gundê Şegekomat ku li ser navçeya Çıldêranê ye kir, 2 cerdevan û 6 lezimên wan hatin kuştin.

Gerîla li ser riya Pîranê (Dicle) nasnameyan kontrol kir, kontrol qederî 3 saetan domiya.

**18 Tebax 1993:** Li Elbîstanê çiyayên Nûrheq û Engîzek bi operasyonên dewletê tîn bombekirin. Gerîla li Qersê gulle reşandin ser avahiyên dewletê yên li navçeya Selîmê û ew xesirandin, li gundê Batmanê, ku li ser Dêrsimê ye jî hêzên dewletê û gerîla li hev xistin. Tîmekî taybetî hate kuştin. Gerîla avêt ser qereqola Belijîn (Bestler) ku li ser Şîrnexê ye, 4 leşker hatin kuştin.

**19 Tebax 1993:** Gerîla otobusa ku leşkeran ji Wanê dibir Mêrsînê, li hêla Melefa ku li ser Hezoya Batmanê ye sekinandin, 11 leşker û 2 çawiş revandin.

Dewletê navçeya Cûlemêrgê Çelê da ber gulleyan, jineke bi hemle hate kuştin û 8 kes birîndar bûn.

Leşker li Geverê meş li dar xistin û gel bi kuştinê tehdît kirin. Di pey de gelê navçeyê xwe ji herême dan alî.

Li Çelê derketina derve qedexe bû. Tê îdiakirin ku dewletê, piştî cerda gerîla ya li ser Tabûra Deştanê û vir, ve li herême çekên kîmyewî bi kar tîne. Ev yek jî, ji şîrên çêlekan ku tê dotin û dema vexwarinê ser dil diêşin, tê fêmkirin.

Gerîlayên ARGK'ê girtin ser gundê Derefê ku li ser navçeya Eskifê ya Batmanê ye, 2 cerdevan mirin 4 jî birîndar bûn.

Li navçeya "Aralik" ya İdirê gerîla bi mebesta xayîntiyê ji gundên "Yukarıkerimbeyli", "Hacıağa" û "Yukarıçamurlu"; Cafer Malgoz, Yunus Seyran û Sebil Lîl kuştin. Li Ruhayê ji dibistana gundê Zokê şewitandin.

distanê dest pê kiriyê, bi şahî pîroz kirin. Pîrozbahîya herî mezin li Elegezê ku bajarekî Ermenîstanê ye, pêk hat. Di vî pîrozbahiyê de ku li seriya hezar kesî beşdar bûbûn, komên muzîkê konser dan û pêşandanên folklorê pêşkêş kirin.

Ji bo 15'ê Tebaxê li Moskovê, civîneke ku nêzî 100 kesî beşdar bûbûn û li bajarê Grosnodarê li Navenda Çanda Kurdî jî

yeke ku zêdeyî 100 kes beşdar bûbûn, li dar ketin. Li hin bajarên Kazakîstanê jî bi vî rengî civîn pêk hatin. Dê li peytexta Gûrcîstanê li Tiflîsê di 22'ê Tebaxê de civîneke dorfireh pêk were. Li Parîsê, bi beşdariya 4000 însanî ve mîfîngek li dar ket. Şahî bi grûbên folklor û muzîkê rengîn bûn. Wekî din esnafên Kurd û Tirk kepengên xwe radan

# PÊNÛS



Amed Tigrîs

## Dijminê mezin û yê herî mezin

Wekî ku xwendevanên Welat pê dizanin, Seyda Abdurrahman Durre di hejmarê 73'an a Welat de bi sernivîsara "Dijminê mezin" nivîsarekê nivîsandibû. Seydayê hêja di nivîsara xwe de dibêje: "Silêman Demîrel, Bülent Ecevit, Mesut Yilmaz û yên din dijmin in, lê Erbakan dijminê mezin e. Ji ber ku ew li ser navê misilmantiyê ji yên din bêhtir dijmintiya Kurdan dike..."

Rast e, ez bi Şeyda re me. Erbakan dijminê mezin e, lê hîn dijminê herî mezin jî hene. Dijminên herî mezin, ên herî xwînwar, ên herî xwefiroş û yên herî cinawir jî hene. Kîne ev dijminên herî mezin? Heft dijminên herî mezin di kabîneya Tansu Çiller de wezîr in. Hikmet Çetin, Mehmet Kahraman, Abdulkadir Ateş, Mehmet Moğoltay, Necmettin Cevherî, Cemil Erkan û Seyfî Oktay in. Ev her heft zebaniyên Kurdistanê ne. Gurên dev û penc bixwin in. Vampir in. Bi biryarên wan li Kurdistanê rojê 20-30 kes tên kuştin. Mal tên wêrankirin. Deşt û çiyayên me tên şewitandin. Ew bi xwe gund û bajarên xwe dişewitînin.

Welat û miletê xwe didin bi meqam û 30-40 milyon lîrayê Tirk. Dê û bavên xwe difiroşin. Xwîna pismam, xal û xwarzanên xwe dirijînin. Xwe înkâr dikin. Namûs û şerefa welatê xwe dikin bin postalên leşkerên dijmin. Belê, dijminên herî mezin ev in. Ma dijminên herî mezin bi tenê ev heft wezîr in? Na! Ji derî wan qasî 150-200 kesî parlamenterên Kurd jî hene ku di nav partiyên dagirkeran de ne. Ew jî di parlamentoya dijmin de, ji bo kuştina Kurdan û wêrankirina Kurdistanê qanûn û biryaran derdixin. Bi dengê xwe kirinên artêşa Tirk di cih de dibînin. Bi van kesên parlamenter re gelekî burokrat jî hene ku li navê nexuyane û ew jî di xizmeta dijmin de ne. Bi dizî û eşkere planên Kurdkujiyê bi kar tînin. Ev hemû dijminên me yên herî mezin û dijar in.

Ji aliyê din ve cerdevanên (cehşên) gundan hene. Çek li milê wan in bi esker û tîmên dijmin re li dû gerîlayan digerin. Namûs û şerefa xwe didin du milyon lîrayê Tirk. Ew qereqol û qîşleyên dagirkeran diparêzin. Bi jin û zarokên xwe ve ketine nav leşkerên dagirker û xwînrej. Ew xwe bi malbata xwe ve difiroşin.

Xwefiroşî û hevkarîya dijmin ne bi tenê di nav Kurdan de hebûye û heye. Ev taybetîyeke kolonyalîzmê û dagirkeriyê ye. Li Hindistanê, Cezayîrê, Vietnamê û gelek welatên din jî xwefiroş û hevkarîya împeryalîst û kolonyalîstan hebûn. Hem jî di her warî û qedemeyî de. Wekî wezîr, parlamenter, walî, general, serleşker, leşker û hwd... Kolonyalîzm û dagirkerî ne bi tenê di warê aborî û îdareyî de ye. Berî her tiştî di warê perwerde û hînkirinê de serê gel dişo. Di nav gel de bêşexsiyetyê fireh û kûr dike. Kesê bêşeref û bênamûs çêdike. Bi madî û manevî mirovan bêşexsiyetyê dikin. Xwefiroşî dikeve rih û xwîna kesên jar û xwepereşt. Kolonyalîst û dagirker dixwazin bi perwerde û hînkirinê hestên (hîsên) neteweyî û welatparêziyê kor û ko bikin û ji navê rakin. Ji ber vê yekê jî bi metod û dîtîninê cuda cuda diçin nav xelkê. Kole û hevkarîya xwe çêdikin. Ew didin pêş û li dijî gel bi kar tînin. Di dawî de jî dema têk diçin wan xwefiroşan li navê dihêlin û direvin. Di dema revê de wan nagirin balefir, helikopter û otomobîlên xwe jî. Dibe wekî roja qiyametê, bav li lawê xwe xwedî dernakeve. Her kes wey li wî ku xwe xelas bike. Li Kurdistanê jî ew roj nêz dibin. Di dema revê de dê bi binê helikopterên Kobra û Skorkî ve li ba bikevin û bikevîne xwarê. Dê xwefiroşan bi xwe re nebîne metropolan, yên ku li wir in jî siktir bikin û bi paş ve bişînin.

**Xwefiroşî û hevkarîya dijmin ne bi tenê di nav Kurdan de hebûye û heye. Ev taybetîyeke kolonyalîzmê û dagirkeriyê ye. Li Hindistanê, Cezayîrê, Vietnamê û gelekî welatên din jî xwefiroş û hevkarîya împeryalîst û kolonyalîstan hebûn. Hem jî di her warî û qedemeyî de. Wekî wezîr, parlamenter, walî, general, serleşker, leşker û hwd...**

# Enstîtuya Kurdî du pirtûk weşandin

Enstîtuya Kurdî ya li Stenbolê bi navê "Pirtûka Wêneyan bi ABC" û "Pirtûkê wênan bi ABC" du pirtûk çap kirin.

Pirtûk bi Kurmancî û Dimilkî ji bo zarokên berdibistanê ango yên ku hîn diçin dibistanên maderî hatiye amadekirin.

Pirtûk bi wêneyan li gorî rêza tîpan a alfabeya Kurdî hatine xemilandin. Li binê wêneyan navê tiştê ku hatiye xêzkirin, hatiye nivîsîn. Ji zarokan jî rengkirina wêneyan tê xwestin.

Pirtûkên ku ji bo zaravayê Kurmancî û Dimilkî hatine amadekirin, mijarên

wan yek in. Bi tenê ji aliyê zarava ve, ji hev cihê nê.

Ev herdu pirtûk ji aliyê Komika Zimên û Pedegojî ku xebatên xwe li Almaniyayê li bajarê Berlinê, li ser navê Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê didomînin, hatiye amadekirin. Di komiteyê de ev kes hene; Alan Dîlpak, L. Jandîl, Î. Nasso, M. Xamevan, A. Yezdan.

Wêne jî, ji xezên wênesaz A. Yanik û Evîn Dîlpak afirîne. Tevî bergên pêş û paş, 40 rûpel e û bi kaxezên spî yên baş hatiye çap kirin.

Di rojên pêşîn de, dê di sa pirtûkên Enstîtuyê ya ni-



Weşanên Enstîtuya Kurdî

**Berga pirtûka bi navê "Pirtûkê Wênan bi ABC" ya bi Dimilkî** vîsandinê û di pey de ji ya xwendinê derkeve. **Navnîşana Xwestinê:** **Tarlabaşî Bulvarî** **128 Beyoğlu - IST**

# Kumikên tîpan tenê mane wan jî nedin ber bayê Tirkbûnê!

Selîm Biçûk

Bi Tirkî em dipeyivin. Bi Tirkî em dihezirin. Bi Tirkî em dixwînin û dinivîsin. Bi Tirkî em radibin û rûdin. Ken û giriyê me jî bûye bi Tirkî. Êdî jîyan û hebûna me di bin barê Tirkbûnê de wêran bû. Di her hêla jîyanê de Tirkbûn û pişavtinê tilî şopên xwe hiştine. Şerê me û Tirkbûnê xwe dirêjî A,B,C'ya Kurdî jî dike. Kumikên Celadet ku dane ser çend tîpan (Ê, Î, Û) û pê xemlek ciwan daye A,B,C'ya Kurdî bûne pirs-girêka zimanzan û nivîskarên me. Di navbera (i, î) yên Kurdî û (ı, ı) yên Tirkî de pirs-girêkeke mezin dibînin û hêsanîkirinê dixwazin

(!). Ev heftê sal in, me kumê M.Kemal bi darê zorê pejirandiye, ev kumê ku mejiyê mirinê xistiye serê me. Lê kumikên Celadet mîna belayê dibînin. Gelo bi hilanîna van kumikan, em çî di A,B,C'ya Kurdî de diafirînin? Bi dîtina min kêmahiyên A,B,C'ya Kurdî ya Latînî nîn in. Bi tenê mirov di tîpên cewî (p, ç, t, k, r) de çareyeke cudakirinê bibîne. Ev jî bi kumikan çareser dibê (p, p̂; ç, ç̂; k, k̂; t, t̂; r, r̂) an jî mîna xwe bimînin û bibin nîşana resênîya zimane Kurdî. Mirov dikare pevdengan jî pîrr bike (xw, kw, gw...). Ji hêla din ve, avêtina tîpa (i) ya Kurdî dengêkî bingehîn di A,B,C

ya (alfabe) Kurdî de kêma dike. Bi kurtî, pêşniyarên ku di civîna 31'ê Tîrmeha 1993'an de ji bo guhertina A,B,C'ya Kurdî hatine pêşkêşkirin, talûkeyeke pîrr mezin e û tu tîkiliyên wan bi zimanzaniyê re tun in. Bêhtir mirov dikare bi psikolojiya Tirkbûnê ve girêbide û mîna dirêjbûna şerê taybetî li ser alfabeya Kurdî binirxîne. Ji bo pirsên teknîkî mirov taybetiyên zimane xwe naxe talûkeyê û pê naleyize. Eger ev pîrr (teknîkî) bibin sedemên guhertinê dê di her welatekî de û di her parçeyekî Kurdistanê de alfabeyek bê bikaranîn û tu caran mirov nikare bi alfabeyeke Kurdî yekgirtî bihizre.

# Bila 'i' bibe 'ı', 'î' jî bibe 'i'

Ahmet Tekîn

Em tika dikin, ji endamên civîna li ser alfabeya Kurdî ku biryara guherandina tîpên 'i, î' ye bistînin. Em xwendevanên weşanên Kurdî dixwazin ku ev herdu tîpên bi gengeşî weke yên alfabeya Tirkî bêne pejirandin. Lewre, îşaret-

kirina herdu tîpan xwendevan şaş dike û wan ji xwendina Kurdî sar û dûr dike. Weke ku birêz Sagnîç dibêje, divê ji herdu tîpan yek tenê bê îşaretkirin û alfabe bê hêsanîkirin.

Di nivîsîna li ser "Civîna li ser Alfabeya Kurdî" ya di rojnameya Welat de em dibihîzin ku Enstî-

tuyên Kurdî yên Parîs û Brukselê û hemû muessesê û şexsiyeten Kurd bersiva vexwendinê hê neda. Ji kerema xwe re pêşniyar û dîtînen xwe ji civîna 21'ê Tebaxê re pêşkêş bikin û xwe bi îradeya neteweyî ve girêdin. Lewre em êdî ne eşîrî ne, lê em êdî neteweyî ne.

# Xebata sivîl

## Şerefxan Cizîrî

Bi giştî li Rojhilata Navîn û taybetî li Kurdistanê fikir û xebatên sivîl, di jiyana politîk û civakî de zêde nayêne naskirin. Rewş û psikolojiya ku xelkên Rojhilata Navîn tê de dijîn û jiyana e, mecal nedaye ku fikir û xebatên sivîl bi pêş kevin. Weke tê zanîn dîroka vî herêmê, dîroka dagirkeriyê, talanê, qirkirinê û milîtarîzmê ye. Ev yek aliyekî meseleyê ye. Lê ji aliyê din ve, cara pêşîn di dîroka cihanê de bajarvaniyê li vir dest pê kiriye, xelkên cihanê bi alîkariya xelkên Mezopotamya û Enebolê hunerê nivisandinê û çandiniyê nas kirine. Çar dînên mezin weke cihutiyê, fi-lehtiyê, zerdeştîyê û misilman-tiyê ji vî herêmê derketine. Ede-biyat û ilm cara pêşîn li vir şax daye. Ez ji destana Gilgameş ke-vintir tu nivîsê din li cihanê nas nakim. Li ser xwedîkirina hes-pa-pan cara pêşîn Mitaniya pirtûk nivisandine... û hwd.

## METODÊN MEŞRÛ: KUŞTIN

Mirov dikare vî listeyê baş dirêj bike, lê armanca min ne ev e. Ez dixwazim bi vî yekê ba-la xwendevanên bikişînim ser niqteyekê; ev jî ev e: Di nav xelkên Mezopotamya û Enebolê de kultur û sivilayeti, li cihanê cara pêşîn li vir dest pê kiriye. Ev rastîyeke dîrokî ye. Lê mirov dikare bi hêsanî jî bibêje; felsefa aştîyê û xebata sivîl di warê politîk de, li vî herêmê tu carî baş nehatiye qebûlînin. Kuştin, we-ke metodeke meşrû hatiye dîtîn. Xurt ew e ku karibe dijminê xwe bikuje! Kuştin, weke rîya herî baş hatiye nasîn. Kuştin bi hemû awayî xelkê bû. Ji bo ku desthilatîya xwe ya politîk bi hemû babetan biparêzin serdestên demê, pirrî caran metodekî barbar bi kar anî. Ji bo ku ew bigihên ar-mancên xwe, hemû metod ser-best bûn. Erê hemû metod! Dix-westin bi vî yekê jî mirovan çav-tirsandî bikin û bandora xwe ya politîk li ser civakê, bi zorê bi dest bixînin. Aşûriyan çermê mi-rovan digurandin, Moxolan gund û bajar dişewitandin, Os-maniyan mirov li qaxoxa dixistin û bav û kalê Sedam Huyesîn jî ev metod hemû bi hev re bi kar dianî! Di nav ewqas barbarî, çavsortî, xerakirin û rasyonâlîze-kirina kuştinê de, Kurd li welatê xwe li dijî hêzên tarî dîsa li ser lingan man û heta roja îro jî, ji-yana xwe berdewam kirin. He-ger zor û milîtarîzmê karibûyana problema politîk û civakî çareser bikirana, ewê îro li şûna xelkê Kurd kundan bixwendana. Lê li Kurdistanê îro bilbil dixwînin.

Fikrên li ser xebata sivîl xwe-diye dîrokeke dirêj in. Bi taybetî


di qirnê 19'an de ev fikir û dîtînatîna sistematîzekirin. Di bin navê neîteatîkirina sivîl de bi a-wayê cur be cur xetên felsefî, dîtî-nên li ser aştîyê û li dijî zorê helwestgirtin, ji qirnê 19 û pêş de beşeke lîteratura politîk pêk tîne. Bi zêdebûna hejmara şerên dijwar û mirovkuj, bi du şerê cî-hanî, bi qirkirina şeş milyon ci-hû, bi windakirina bîst milyon Rusan di Şerê Cihanê ya Duda-yan de, bi kolonyalîzma hem-dem, bi Hiroşîma û Nagazakî, bi qirkirina xelkê Ermenî, bi şerê li Vietnâmê û bi pêşxistina berhe-ma teknolojiya qirkirinê, bala mirovatiyê hêdî hêdî derbasî ser fikrên aştîyê û pêwistbûna xeba-ta sivîl bû. Tiştên ku mirovan bi keda salan ava kiribû, şer di wextekî kurt de xerab dikir. Ev yeka han tiştêkî pirr berbiçav bû...

## XERABÎ BAŞIYÊ BI BÎR TÎNE


Di dema Antîk de şerê navbe-ra Atîna û Sparta pirr bi nav û deng e. Atîna û Sparta du eşîrê Grekiyan yê cihê cihê bûn. Ev şerê hanê li xelkê Grekî tesîreke pirr mezin û xerab kiribû. Nivîs-ka-rê Grekî Aristofanes bi navê Lysistrate şanoyekê li ser bûyera şer û aştîyê nivîsandin. Mijara şanoyê bi kurtî ev e: Jinên Grekî ku her roj dibînin di şer de law û mîrên wan têne kuştin, dix-wazîna li hemberî şer rawestînin. Lysistrate ku seroka van jiyana n e, wan or-ga-nîze dîke û dest bi greva seksê dîke. Jin ji mîran re dibêjin, " Ya hûnê dev ji şer-kinê berdînin, yan jî em bi we re ranakêvin!

Ya jiyana, yan jî şer, divê hûn bir-yara xwe bidînin." Erê şano li ser problemên aştîyê, şer, seksê û danûstandinên jin û mîran tî honandin û fikrên li ser şer û aştî-yê dîde munaqesekirin. Bi ba-werîya min dîtînen Aristofanes î-ro jî aktuel in. Babeta berxwedana sivîl çî formî bigire bila bigire, divê bêye parastin û pêşdexistin. Dayîk û keçên Tirkî, Ereban û Farîsan divê îro jî Aristofanes bixwînin û dest bi grevên evîne bikin!

Di qirnê hijdeyan de Marks xwest çend caran xebata sivîl bi awayekî aktîv bike. Wexta ku pêla şoresê li Ewropayê xurt bû (1840-50), li dijî hikûmeta Almanî Marks kampanyayekê ve-ki-rîbû. Marks xelkê Almanî da-wetî bac (vergî, zîkat) nedanê di-kir. Pirrî caran wexta ku me-calên xebata demokratîk li Ew-rû-



Rejîsorê sînemayê yê Japonî Akîro Kurosawa



Nivîskarê navdar yê Îngilîz Sir Walter Scott

payê kêmbû, Marks û tevgera karkerî, rîyê nû ji politîkayê re didîtin. Ji bo mînak em dikarin vî bîjin; beriya ku Marks ji Al-manya sirgûn bibe, li pirr cihan komeleya perwerdekirina karke-kan saz kiribû. Ji aliyê şekî ve ev komele raste rast bi politîkayê mijûl nedibûn. Lê di civînen xwe de li ser perwerdekirina karke-kan disekekin. Perwerdekirina karker a bi xwe, karekî şoresgerî bû. Bi kurtasî mirov dikare bibê-je ku, xebata sivîl bi hezar babetî dikare bê meşandin. Jixwe xeta xebata sivîl jî di vî yekê de ye. Heger mirov xebata leşkerî we-ke çemkî bibîne, xebata sivîl jî derya ye.

Ji bo ku mirov bikaribe bibe xwediyê awirekî giştî, li ser xe-bat û berxwedana sivîl, divê mi-

ni Akîro Kurasawa pirr caran xelatên navneteweyî ji bo filmê xwe yê li ser jiyana û dema sa-mûrayan standine. Weke mînak mirov dikare filmê "Robin Ho-od" hemû caran ji cara berî xwe aktueltir bûye. Li Amerîkayê bi hezara roman û film li ser kov-boyan ango "gavanan" hatine nivîsandin û çekirin. Ev beşekî ji dewlemendiya kultura Amerîka-nî ye. Mirov di vî warî de dikare mînakî pirr bike, lê ez vî yekê hewce nabînim. Lê di vî mijarê de tiştêkî pirr vekirî heye; heqê hemû xelk û neteweyan heye ku di edebiyat û hunera xwe de behsa dîrok û jiyana xwe bikin.

## PÊŞVERÛTÎ DI XETA REALÎTEYÊ DE YE

Kesê marksîst divê jî vî yekê netirsîn. Mijara edebiyat, film û stran heger kevna be, ev yek raste rast nabe kevnepe-restî. Roman û filmê ku mijara wan li ser Ka-wayê Hesinger be otomatîk na-be pêşverûti an jî kevneperestî. Kevneperest-bûn û pêşverûtiya edebiyat û film ne di mijarê de ye, lê belê di alîgirtin, dilxwazi, naverok û xetê de ye. Di metodekî gotin û nivîsandinê de ye. Pirr caran Marks û Engels behsa vî prob-le-mê dikin û dibêjin ku pêşverûti di xeta realistî de ye. Divê nivîs-ka-rê û filmçêker di hûnerê xwe de behsa "karekerekî tîpîk di mercên tîpîk de" bikin. Ev yek jî bo Marks û Engels di huner-mendi-yê de sixletên bingeîn pêk tî-nin. Ma mirov dikare di dema e-şîrtî de behsa febrîqe û proleter-yayê bike? Febrîqe û proleterya di kapîtalîzmê de hene. Di civata eşîrtî de axa û mîr hene, xulam û rênçber hene, nakokiyên eşîrtî hene, lê proleterya tune ye. Pêşverûti di edebiyat û film de realîzm e, rastî gotin û parastin e...

Bi awayekî giştî mirov dikare bibêje ku, di civaka Kurdî de hej-

mara kesê ku dikarin bixwînin û binivîsinin pirr kêmbûn in. Ev rastî-yeke dîrokî ye li Kurdistanê. Li şûna nivîsandinê, Kurdan bêhtir hez ji gotin û guhdarkirinê kiri-ne. Ev yek îro jî problemeke kul-turî ye. Her çiqas gotin û guh-darkirin weke fenomenên kul-turî, hêdî hêdî li paş jî mabîn, dîsa jî mekanîzma û berhem di vî wa-rî de pirr xurt in. Mirovê Kurd dîsî-plîna û perwerdebûna xwe ne li gorî qaîdeyêke kultura nivîsan-dinê girtine. Ji ber vî yekê, ber-hemên nivîsandî zêde li Kurdis-tan tune ne. Ku di vî warî de mi-rov muqayese di navbera Kurd û neteweyên din de bike, ewê ferq pirr eşkere bê dîtîn.

Li şûna nivîsandinê li welatê me gotin bêhtir pêş ketiye. Û ji ber vî yekê jî mitirbî, ji aliyê hu-ner ve li Kurdistanê pirr xurt bû-ye. Hebûn û hunermendiya Kur-dan li cem mitirban kom bûye. Mitirb kaniya hunerê ne û Kurd divê, vî kaniyê gelekî baş bi kar bînin.

Mitirbê ku ez jî nêzik ve nas dikim sê kes in; Mihemed Eliyê Kercewî, Reşîdê Omerî û Mi-radê Kinê. Repertuara wan her sê mitirban hem jî epîkên kevna-re û hem jî, jî bûyerên modern pêk tîne. Kêmbûna jî zêde her sê mitirb eynî stran û bûyeran dibêjin. Ferqa di navbera gotin û stranên wan de ne bingeîn in, lê belê şexsî ne. Bûyer û epîkên ku stran li serê ava dibin pirr ca-ran li nav Kurdan baş tîne nas-kin. Weke mînak mirov dikare bibêje, şerê li ser berxwedana Omerîyan, (Mala Eliyê Ehmed li çiyayê Merzeqa û berxwedana Tinatê ku, gundekî Omerîya ye) jî aliyê xelkê herêmê ve baş tî naskirin. Di şerê li ser Tinatê de Elîkê Batê jî beşdar dîbe. Li hemberî leşkerê Tirkî, Elîkê hatîbû hewara Omerîyan. Elîkê bi Şemûnê Henna Heydo û paz-deh peyan re beşdarî şer dibe. Di şerê Tinatê de hêza Elîkê Batê pirr hindik e. Min ev tişt jî mirovê ku beşdarî şer bûbûn bi-hîstîye. Şerê li ser Mala Eliyê Ünis (Ji berxwedana Sasonê) jî, dîsa jî aliyê xelkê Kurd ve pirr baş tî naskirin.

Wê bidome

# Ronakbîrê mezin Nûredîn Zaza

● Di sala 1915'an de hikûmeta Osmanî fermana Ermenîyan radike, dest bi kuştin û qetlîama wan dike. Hîn serokeşîrên Kurd jî alikariya hêzên Osmanî dikin. Gelek Kurdên din li cîran û kirvên xwe yên Ermenî xwedî derdikevin, wan ji mirinê difilitînin. Dê û bavê Zaza keçeka Ermenî bi navê Caco li mala xwe vedîşêrin û xwedî dikin. Piştî lihevkirina Lozanê (1923) koçemal hêdî hêdî Madenê terk dikin û Maden kavil û wêran dibe.

## Bêrîvana Dêrsimî

Bi rastî pirtûkek tîr nake ji bo nasandina jiyana ronakbîrê mezin. Lê ez dixwazim di vî nivîsarê de jiyana wî ya rengîn û dewlemend, bi gotina wî: "Jiyana min a Kurdî" bi bîr binim.

Ronakbîrê mezin, Nûredîn Zaza di sala 1919'an de, li bajarê Madenê (ku niha bajarok e di navbera Xarpût û Amedê de) hatiye dinê. Wê demê 20 hezar rûniştvanên Madenê hebûn. Dîroka pêşveçûna wî bajarî û ya malbata Zaza bi hev ve girêdayî ne. Kalê kalikê Zaza, Îbrahîm Efendî ji eşîra Şadiyan di sala 1780'an de hatiye Madenê û bûye hakimê wê. Îbrahîm Efendî mirovekî jîr û zana bûye. Wêk rûniştvanên piraniya bajarên Kurdistanê, bi tacîrî û esnafiyê mijûl bûye. Ew radibe ji Trabzonê (bajarekî li ser qerexê Derya Reş ku ji demên kevin ve bi maden û endustriya xwe naskirîye. Piraniya niştvanên wê Rûm, Yewnan bûn) nêzîkî 500 malên Rûm tîne li Madenê bi cih dike ku ew kaniyên madenî yên wir bi kar bin. Di nav wan de hostayên avakirinê jî hebûne. Îbrahîm Efendî bi wan û bi karkerên Kurd re pîr medrese û xaniyan dide avakirin. Di sala 1792'an de sifir (bakir) tê deranîn û dibe kaniyeke dewlemendî ji bo vî bajarî. Lê mixabin di sala 1830'an de dewleta Osmanî zêde tehemula kar û xebatên Îbrahîm Efendî nake û sîrgûnî wî derdixin Stenbolê. Îbrahîm Efendî naxwaze terka Madenê bike û here Stenbolê. Li ser vî, Sultan Mahmud qasî 10.000 leşkerên xwe dişîne ser wî. Îbrahîm Efendî, ji bo bajarê ku pêvajoya 40 salî bi xebatên heja ava kiribû, di şer de neyê wêrankirin, şevêkê kincên derwêşekî li xwe dike û bi dizî Maden û welatê xwe terk dike, diçe Yemenê û li wir wefat dike. Kurê wî Mistefa tevî diya xwe li Madenê dimînin. Ew dixebitin, milkên bavê xwe yên ku dewletê dest danibûn ser hêdî hêdî dikirin. Kurê wî Îbrahîm dibe waliyê Madenê. Ew ji bo dostaniya cemaetên Kurdî, Yewnanî, Ermenî û Tirkî yên Madenê dixebite.

Di sala 1915'an de hikûmeta Osmanî fermana Ermenîyan radike, dest bi kuştin û qetlîama wan dike. Hîn serokeşîrên Kurd jî alikariya hêzên Osmanî dikin. Gelek Kurdên din li cîran û kirvên xwe yên Ermenî xwedî derdikevin, wan ji mirinê difilitînin. Dê û

bavê Zaza keçeka Ermenî bi navê Caco li mala xwe vedîşêrin û xwedî dikin. Piştî lihevkirina Lozanê (1923) koçemal hêdî hêdî Madenê terk dikin û Maden kavil û wêran dibe.

Sal 1925. Hikûmeta Tirk a nû ya Mustafa Kemal dest bi qedexekirina mafên Kurd û qirkirinê dike. Serhildana Şêx Seîd dest pê dike û ew di nav çend mehan de di xwînê de tê perçiqandin. Bi hezaran kes tîr girtin. Di nava wan de, bavê Nûredîn, birayê wî yê mezin apê wî, pismamê wî Osman efendî jî hebûn. Dema ku leşker ew girtî dibin, xelk li dora wan dicivin û Osman efendî bi dengêkî bilind diqîre, "Bijî Şêx Seîd!" Leşker, ji bo wî ceza bikin wî tazî dikin, bi darekê ve girê didin û şevêkê li derve dihêlin. Ew di wê şeva sar de, li ber sermayeke xurt dicemide û şehîd dikeve. Bavê Zaza jî 15 meh di zindanan de dimîne û paşê tê berdan.

1927'an de li Tirkîyê hîlbijartînen navçeyî û belediyê çêdibin. Li ser daxwaza Kurdên Madenê birayê Zaza, Dr. Nafiz namzêdiya xwe datîne û tê hîlbijartin, dibe şaredarê (serokbelediyê) Madenê. Ew doktorê yekemîn bû ku ji vî bajarî derketiye, daxwaza wî ya pêşîn ew bû ku li Madenê nexweşxaneyekê bide avakirin.

Di bihara 1928'an de hikûmet hemû şaredarên hîlbijartî yên bajarên Kurdistanê ji kar digirin û di şûna wan de karmendên xwe tayîn dikin. Dr. Nafiz diçe Amedê û li wir doktoriya serbest dike. Di sala 1929'an de Nûredîn xwendina pêşîn li Madenê dixwîne û ji bo xwendina navîn, tê Amedê cem Nafiz.

Sal 1930. Di bin serokatiya Îhsan Nûrî Paşa û rêberiya Xoybûn de, Serhildana Agirî dest pê dike. Lê mixabin, mîna serhildana Şêx Seîd temenê wê jî dirêj nabe û di xwînê de tê perçiqandin. Mustafa Kemal berpîrsiyariya giştî ya vî siyasê dibe hevalêkî (Îbrahîm Talî) xwe. Îbrahîm Talî Çerkez bû, lê wekî gelek îxanetçîyan ew jî Tirkîyekî har û mar bû. Talî kesên ku teslîm nebûbûn, an jî xwe nedane ber çûyîna sîrgûnê, davêtin zîndanê an jî didan kuştin. Wê demê sîrgûna Dr. Nafiz derdixin Îzmîrê. Her çiqas Dr. Nafiz nedixwest ku welat terk bike, jî mixabin, dema biryara girîng hatibû. Ew û malbata wî tevî birayê wî yê biçûk Nûredîn di payîza 1930'an de bi hinceta çûyîna Îzmîrê ji Amedê bi rê dikevin û rêça xwe didin windakirin, bi



Kadî Cemîl Paşa (ê rûniştî), ên li piyan; Nûreddîn Zaza, İsmet Şerîf Wanlî û Cemşîd Bedîrxan bi hev re.

qaçaxî derbasî Sûriyê dibin. Bi alikariya Kurdan ew li Şamê bi cih dibin.

Dr. Nafiz dest bi doktoriya xwe dike û di demeke kurt de xwe bi Kurdên Şamê dide hezkirin. Lê daxwaza wî ew e ku demeke zûtir biçe Kurdistanê. Ew û Nûredîn li lîseyaya Fransîzî ya Şamê dinivîsin. Di sala 1935'an de Nafiz derbasî Cîzîrê dibe û paşê jî diçe Qamişloke û li wir dixebite.

Sal 1937. Berxwedana Dêrsimê. Şewitandin, bi hezaran kuştin, balefirên Enqerê bombe û mirin dibarînin ser Dêrsimê, di nav bédengiya cihanê de. Zaza bi van bûyeran gelekî xemgîn dibe. Li lîseyaya Fransîzî ya Şamê tevî çend hevalên xwe yên Kurd delegasyonê pêk tînin û diçin hin sefaretên welatên Ewrûpî. Lê mixabin daxwaza wan bibeberîv dimîne. Ev delegasyon paşê "Yekîtiya Xwendevanên Kurd" (Hêvî) ava dikin. Bi qasî 15 endamên xwe, sal û nivê çalakî (faaliyet) nîşan didin.

Di nav van xebatên heja de Zaza lîseyê xelas dike. Nafiz lê şîret dike ku ew Zanîngehê Tibbiyê bixwîne. Lê ew naxwaze, biryar dide ku here li nava Kurdên Cîzîrê, xebata siyasî bike. Wê demê nasdariya xwe bi Cegerxwîn û gelek ronakbîrên heja re çêdike û heta demeke dirêj bi wan re dixebite.

Di sala 1944'an de Îran û Iraq hin mafên çandî û idarî yên Kurd

qebûl dikin. Zaza jî bo dîtina Berzanî di Tirmeha 1944'an de bi qaçaxî derbasî Iraqê dibe û di rê de tê girtin. Salekê di girtîgehên Iraqê de dimîne. Di sala 1945'an de berdan û derbasî Bêrûdê dibe. Xwe li zanîngeha Fransîzî dinivîsîne û dest bi xwendina zanîtiyên siyasî dike. Li cihê Kamuran Bedîrxan, dibe berpîrsiyarê bernameya Kurdî ya Radyo-Bêrûd. Bernameya Kurdî heta dawîya 1946 dom dike û Zaza ta dawiyê berpîrsiyariya wê digire ser xwe.

Di sala 1947'an de Zaza diplomeya xwe ya lîsansê distîne û ji bo doktora diçe Swîsre. Li Zanîngeha Lozanê dest bi teza xwe ya doktoriye dike. Di gel 5 hevalên xwe yên Kurd "Yekîtiya Xwendevanên Kurd li Ewrûpa" ava dikin (1949) û gelek xebatên heja pêk tînin. Zaza di sala 1956'an de doktora xwe xelas dike û vedigere Sûriyê. Li wir dibe profesorekê pedagojî û sosyolojiyê li Zanîngeha Şamê. Wê demê Zaza, Osman Sebrî û çend ronakbîrên Kurd ên din, di sala 1957'an de Partiya Demokrat a Kurd a Sûriyê ava dikin. Armanç; ji bo Kurdên başûrê rojava mafên çandî û idarî bi destxistine. Partî Kurdên welatparêz li dora xwe dicivîne û gelek kar û xebatên heja pêk tîne. Lê mixabin, bi kar û xebatên heja bala polisên siyasî dikîşînin ser xwe. Roja 5'ê Tebaxa 1960'an, qasî 15 serokên partiyê li Helebê tîr girtin. 8'ê

Tebaxê, Zaza jî tê girtin. Di nav çend rojan de hejmara girtiyan digihe 5 hezar kesî. Di nava wan de zarokên 12-15 salî jî hebûn. Piştî çend rojên lédan û çekirina fişên polîsî, pîraniya wan tîr berdand. Ji Zaza, Osman Sebrî û Reşîd Hamo re cezayê idamê dixwazin. Ji bo berdana wan ronakbîrên Kurd kampanya îmza çêdikin. Di dawiyê de mehkeme salek û niv ceza dide wan. Zaza û hevalên wî roja 8'ê Tebaxa 1961'an tîr berdand. Di 8'ê Adara 1963'an de Partiya Baas bi darbeyek leşkerî tîr ser hikûm û li dijî Kurdan zîlm û zorîyeye dijar dest pê dike. Zaza mecbûr dimîne û derbasî Bêrûdê dibe. Li wir xwe dide xebata nasandina tevgera Kurdî ya başûr. Bi gelek rojname û şexsiyetên siyasî re pêwendiyên datîne. Ev xebat hikûmeta Bexdayê aciz dike û li ser daxwaza polîsê Lubnanî Zaza digirin û di roja 21'ê Nîsana 1966'an de li balefirekê siwar dike, dişînin Amanê-Urdinî, teslîmî polîsên Sûriyê dikin û Zaza car din dikeve zîndanên Sûriyê 7 meh tê de dimîne. Paşê wî dişînin sîrgûna Cebel Durzî. Di nîsana 1967'an de derbasî Şamê dibe. Wê demê Sûriyê ji bo wî bûbû zîndan. Li ser şîretên hin hevalan û daxwaziya birayê wî Reşo (ku li Madenê mabû) bi qaçaxî derbasî Kurdistanê Bakur dibe. Heta havîna 1970'an ew geh li Kurdistanê, geh li Stenbolê niv-veşarî dijî. Lê mixabin, qomployên polîsan hêdî hêdî dest pê dikin û ji ronakbîrê nemir re li Rojhilata Navîn starek namîne. Dîsa xerîbî. Riya Swîsre digire û li bajarê Lozana ku xwendevaniya xwe kirbû bicîh dibe.

Di sala 1972'an de, di 53 saliya xwe de, bi rojnamevanekê Swîsreyî re dizewice. Di newroza 1973'an de kurekî wî çêdibe (Şengo Valery). Ew di wan salan de ji aliyekî mamostetiya Fransîzî didomîne û ji aliyê din jî, ji bo nasandina doza Kurd di rojnameyan de dinivîse û derdikeve ser radyo û televîzyonên Swîsre. Ronakbîrê mezin, gelek nivîsar di rojname û kovarên Kurdî, Erebi û Fransîzî de nivîsîne. Wekî din, romana Erebi Şemo "Şivanê Kurd" ji metnê wergerandina Fransîzî ya B.Nikîtin, kiriye Kurdî û çap kiriye. Li Bêrûdê berhevokek helbestan bi navê Şerê Azadî derxistîye. Bi zimanê Fransîzî jî du pirtûkên wî derketine: Contes et légendes du Kurdistan, Ma vie du Kurde (Jiyana min a Kurdî).

Di demên dawî de li ser wergerandina Fransîzî ya Mem û Zîna Ehmedê Xanî dixebitî.

Ronakbîrê nemir, di 7.10.1988'an de li bajarê Lozanê ji nexweşiya qanserê çû ser dilovaniya xwe. Bi beşdarbûna malbata wî û gelek ronakbîr û hevalên wî yên nêzik li goristana Lozanê ku, Kurdistan di sala 1923'an de li wir hatibû parçekirin, bi merasîmekê tê veşartin. Her çiqas cenazê ronakbîrê nemir li ser axa Lozanê hate veşartin jî, giyana (rihê) wî li ser axa Kurdistanê dijî.

### Çavkanî:

1. Ma vie du Kurde (Jiyana min a Kurdî) Nûredîn Zaza
2. Kurdistan Tarihinde Dersim (Dî Dîroka Kurdistanê de Dêrsim) Nûrî Dêrsimî

Di welatekî bindest de vejîna Kurdî:

# Cografya Kurdistanê

● Pirtûk bi "Cih û qada Kurdistanê" dest pê dike. Li vir mirov rastî mezinahiya erd û rûniştvanên Kurdistanê û Kurdistan di nav kîjan merîdyen û paralelan de dirêj dibe, tê. Nexşeyên Kurdistanê bala şagirt û xwendevanan zû dikişîne ser naveroka mijarê. Di van nexşeyan de mirov rastî bajar, gol, deşt, çem, çiyayên Kurdistanê û cîranên wê tê.

## Gavan Koçer

Çend sal berê bi Kurdî xwendina cografya Kurdistanê xeyalek bû. Kê dizanibû ku ev xeyal wê rojek bibe rastî. Lê, ev roj hat û xeyala mêlijyan bû rast. Dema min dest bi nêrîna pirtûka "Cografya Kurdistanê" kir, gotinên jorîn wek filmê dokumentî di ber çavên min re derbas bûn.

Cografya Kurdistanê ji çar beşan pêk tê. Mijarên her çar beşan jî di bingehê xwe de yek in. Lê, naverok û dewlemendiya mijaran li gor rewş û parçeyên welêt diguhere. Mijarên bingehîn ev in: Rûerd, avhewa (klîma), bendav (baraj), heyiyên (jêderên) serûbin erdê, çandinî, pez û dewara, çûnûhatin, bajar.

Pirtûk bi "Cih û qada Kurdistanê" dest pê dike. Li vir mirov rastî mezinahiya erd û rûniştvanên Kurdistanê û Kurdistan di nav kîjan merîdyen û paralelan de dirêj dibe, tê. Nexşeyên (xerîte) Kurdistanê bala şagirt û xwendevanan zû dikişîne ser naveroka mijarê. Di van nexşeyan de

mirov rastî bajar, gol, deşt, çem, çiyayên Kurdistanê û cîranên wê tê.

Di beşa yekemîn de cografya Kurdistana Bakur hatiye nasandin. Li piştî şîrovekirina kurt a li ser rûerdê, çiyayên bi nav û deng -Çiyayên Torosê- wek "Bakurê Torosan û Başûrê Torosan" bi dorfirehî tîrî şîrovekirin. Li ser mijara "Bakurê Torosan" wêneyek ji zozanên Agriya Biçûk mijar xemilandiyê. Di wêneyê de keriyê pez di ber de berx di rastekê de mexel bûye. Ji mexel bûna pez mirov têdigihe ku, zozan hênik e. Xalo jî çoya wî di dest de bi kofî û kincên xwe yên folklorîk li ser piyan sekinîye û poz daye. Li ber wî jî miha kewsor bi dayîna şîrê xwe ve evîniya dayikan dide nîşan.

Her gava ku mirov rûpelan diçerixîne, heyecan zêde dibe. Mirov xwe zînde his dike û bi lezîna çerxandina rûpelan dike. Çi nayê ku; bi rindî û dewlemendiya xwe, bi mezinahî û pêkhatina xwe ve Deştê Îdirê, bi rengşîni, masî, kûrahî û giravên xwe

ve golên Wanê û Wirmiyê -du gol ku xwedî sembolen dîrokî ne- bi av û dengên xwe ve çemên Ferad û Dicle -ku di dinyê de wek Eurofirad û Tîgrîs nav girtin û bûn xeyal û dergûşa mîstîka şarezaya Mezopotamyayê, bi dîrok û 7 deriyên bedena xwe ve Amed, bi fêkî û hêşînahiyê xwe ve Meletî, bi dewlemendiya krom û sifirê ve Guleman û Maden (kî Kewusaxa ji bîr dike), bi bilindahî û xeyaletbûna xwe ve warê bav û kalên Kurd çiyayên Zagrosê- dil û bûka Kurdistanê, çiyayên ku li dijî dijimanan bûbûn stargeha bav û kalan û ji wan jî dewrî zarokên wan bûne-, bi bîrên Babê Gurgur, Cembûr û Bayhasen ve Kerkuk...

Lê pirtûk bi wan tenê xelas nabe. Hê çî tune ku; Kela Hewlêrê, Girê Kalîçaxa, Şikefta Şaneder, Deştê Cizîrê, Deştê Kobanê, rindiya Enîwerê, Yekbûna Kamîşlo û Nisêbinê, dewlemendiya petrolên Batman, Rimelan û Kirmanşahê û hwd.

Dem a mirov Cografya Kurdistanê dixwîne, dikare ji xwe şik bike. Gelo ez li wir mezin bûm? Ev welatê min e? Çawa bûye ku min hawirdora xwe nas nekiriye? Lê, nivîskarên pirtûkê, te ji xeyala vê gumanê dûr dixin û dibin nav rûerdê Kurdistanê. Tu ji nû ve vedijî, di nav gul û kulîlkên deşt û çiyayên Kurdistanê yên delal de ve-

jen digirî. Giyan û mêj bi bêhna xwezayê nû tije dibin. Bêhna gelî û newalên kûr û bi dar û ber. Di demsala payîzê de, di bin dengê bilûra şivanan û qubana çûkên demsali de, çûyîna ser avê, keriyê pez mirov serûbin dipêçînin. Bêhn fireh û raman ji tevliheviyan dûr dikevin.

Nivîskarên pirtûkê, xwe ji bikaranîna zimanekî tevlihev dûr girtine û hevokên kurt û sivik bi kar anîne û mijarên xwe bi wêneyên rengo rengo xemilandine. Mirov hema hema di her rûpelê de rastî wêneyên ku bi naveroka mijaran ve girêdayî ne, tê. Vê yekê hem xwendina pirtûkê hêsantir kiriye û hem jî qelîteya pirtûkê zêde kiriye. Di dawî de hebûna ferhengokekê jî rîya xwendevanan vekiriye. Berga pirtûkê jî bi wêneyên 2 bajarên Kurdistana Başûr hatiye xemilandin. Berfa zivistana Selehedîn û payîza Silêmaniyê.

Di vê pirtûka hêja de hinek kêmasî jî hene. Ji van sedeman ku tê zanîn der barê nifûsa Kurdan de heta îro hejmartineke bi rêk û pêk çênebûye. Ji bo vê yekê, li ser nifûsa Kurdan ji hev cuda dîtî hene. Dibe ku hejmara Kurdan ji yê pirtûkê kêmtir an jî zêdetir be. Hege nivîskarên di pirtûkê de ev yekê bianîna ziman, baştir dibû. Formulekirineke wiha gumanan ji holê radike. Hi-

## COGRAFYA KURDISTANÊ



Berga pirtûka 'Cografya Kurdistanê'

nek jî dikarin bibêjin ku, pirtûkê hemû mijarên cografyayê negirtine û mijarên ku hene jî bi dorfirehî nehatine nirxandin. Bersiva vê yekê ji aliyê nivîskarên ve di pêşgotinê de hatiye dayîn. Li hinek cîhan mirov rastî kêmasiyên teknîkî jî tê. Mînak; di rûpela 13'yan de, di şûna rûerd de rûer û di rûpela 11'yan de şûna "m" ya Dêrsimê ketiye ser rêza Murad, Dersi tenê maye. Li hinek deran jî dema gotin ji hev veqetiyayî, xêza "-" hatiye ji bîr kirin. Lê, li hemberî hêjatiya pirtûkê ev qet tiştek jî nîn in.

Pirtûka Cografya Kurdistanê, wek ku nivîskar jî di pêşgotinê de dibêjin di pileya (derece) yekemîn de ji bo şagirtên dibistanê hatiye amade kirin. Şagirtên pêngava navîn û bilind. Lê, li gor bawerîya min mezin jî dikarin gelekî feyde ji vê pirtûkê bibînin. Ji ber belavkirin û dagirkeriya welatê me, em bi rîya mekteban, der barê cografya welatê xwe de heta îro nebûne xwedî zanînekî bi rêk û pêk. Ên ku hîn bûne jî bi çavên perwerdeya dagirkeran welatê xwe dîtine. Ji hêla din ve jî di nav Kurdan de ji bo nasîna welatê xwe, gerîna nebûye adet.

Em di vê baweriyê de ne ku, dê ev pirtûk feydeyekî mezin bigihîne şagirt, xwendevan û pirtûkxaneya Kurdî. Jixwe ev cara yekemîn e ku, mirov dikare der barê her çar parçeyê cografya welatê xwe de, bibe xwedî agahî.

Çapa yekemîn ya pirtûka Cografya Kurdistanê, di meha hezîranê ya 1993'yan de li Swêdê di nav weşanên APEC-Tryck û Fqrlag de derket. Navnîşana xwestinê li jêr e:

HQR-Lagret  
Box 8133,  
700 08 Qrebro  
Best, Nr.4401-9  
Sweden

## Fîlmên li ser Ermeniyan li Parîsê



Sahneyek ji filmê 'Hespên Agir'

**Paris, Welat-** Li Centre Georges Pompidou (Navenda Çandî) salê carek filmên welatekî tîrî nîşandan. Îsal jî, ji 9'ê meha Hezîranê heta 18'ê Cotmehê 120 filmên (1907-1992) Ermenî nîşan didin.

Di nava van filman de gelek filmên bi nav û deng (diyarî standî) hene. Di pîrrianiya filman de jenosîd, êş û kul, jiyana welat û xerîbiyê û hwd. dane şixulandin.

Ji van filman:

1. Amerîka Amerîka (États-Unis)

Di gel Elia Kazan, Stathis Giallelis, Franck Wolf, Elena Karam 1963, 168 deqîqe, spî û reş

Jenosîda 1896'an dide şixulandin.

xulandin.

2. Avril (URSS) Nîsan

Di gel Vigen Tchaldranian, Levon Nersissian, Karen Djanibekia 1985, 30 deqîqe, rengîn.

Jenosîda 1915'an dide şixulandin.

Diyariya Festîvala Navneteweyî (Moscow 1987) standiye.

3. Les Chevaux de feu (Ukraine Soviétique) Hespên Agir.

Di gel Serguei Paradjanov, Ivan Mikolaïtehouk, Larissa Kadotchniko 1964, 96 deqîqe, rengîn.

Evîna Ivan û Maritchka li gel hemû kîna û neyartiyên malbatî.

# Çend şîretên zêrîn

● Zanyar (alim), mamoste ji hev û din cihê ne. Dibe ku mirovek pîrr zana hebe lê ne pêwîst e ew zanyar, zanibe bide zanîn. Yanî elimandin jî ilmekî cihê ye. Dema ku ev herdu wesîf di mirovekî de hebin, ew mirov dibine rêberên civakê. Lê her zanyar ne rêberê civakê ne. Zehfên wan rêberê mala xwe û şewqa berjewendiyên xwe ne. Gel tu fêdeyê ji wan nabîne.

## Î. Omerî

Çend pend (şîret) ji bo nivîskarên me yên li Ewropa, nema ze yên li Swêdê, xortên me yên çûn Swêdê, hîni zimanê Swêdî û çend zimanê Ewropî, mîna Almanî, Îngilîzî û Fransîzî bûne. Pirtûkên kevnepî û yên hemdemî ku gelek ji wan dikevine pêşbaziyên û xelata Nobelê distînin, dikarin bide bixî û bixwînin lewre derfeten wan fireh in. Bi xwendina wan pirtûkan bûne ronakbîr. Ewqas bi pêşve çûne, bûne pisporê xwendina pirtûkan. Dixwazin ji Swêdê tîrêjê şewqa xwe biavêjin welat û bi van tîrêjan welat ronahî bikin û gelê me bi ronahiya wan ronahî bibin. Gihîştine serpillka (merhaleya) wergerandina pirtûkan. Ji bo çapkirina pirtûkên xwe, dirava (pere) ji Saziya Alîkariya Nivîskarên dixwazin û distînin jî. (Binêr: Rojnameya Welat, hejmar 50, rûpelê 3'yan, Hawar) Ji bo firotina wan jî mazata herî berbihev (musait) Kurdistanê dibînin û me vexwendiyê xwendina pirtûkên Ewropî dikin. Di vê babetê de kêmasiyên xwe nabînin, divê em kêmasiyên wan ji wan re bibêjin û bi wan bidine zanîn. Bila vê jî bizanibin ku em ne li hemberî wan in, ew jî ji me ne. Em zehf hez ji wan dikin. Di warê zanistî de pêşve-

çûna wan ji me re serbilindahî û pêdiviyê herî mezin e.

Zanyar (alim), mamoste ji hev û din cihê ne. Dibe ku mirovek pîrr zana hebe lê ne pêwîst e ew zanyar, zanibe bide zanîn. Yanî elimandin jî ilmekî cihê ye. Dema ku ev herdu wesîf di mirovekî de hebin, ew mirov dibine rêberên civakê. Lê her zanyar ne rêberê civakê ne. Zehfên wan rêberê mala xwe û şewqa berjewendiyên xwe ne. Gel tu fêdeyê ji wan nabîne.

Dibe ku ew bijîşkên pispor bin, zanibin nexweşî çî ye û dermanê wê jî çî ye, lê nexweş nas nakin (bela ku nexweş nedîtine). Tedavî ne li gor nexweşîne, divê li gor nexweş bête kirin. Tedavî ne li gora nexweş be, nexweş tu fêde ji wê tedaviyê nabîne, dibe ku jê re bibe nebaşî jî. Nivîskarên me yên li Swêdê (gerçî ew ne nivîskar in, wan çavên xwe berdane wergêriyê) zehf bi pêş ketine û ronakbîr bûne lê ronakbîriya wan ne li gora gel û civaka me ye. Divê ew xwe li gora gelê me eyar bikin. Vê jî baş bizanibin, ronahiya pîrr, carina tarîtiyê çêdike. Bi xwe re dikevin hevberiyê, di nivîsê xwe de dibêjin, "Zaroka hîni meşê nebûbe, ne mimkûn e hîni bezê bibe." Wan jî hê gelê xwe hîni xwendina çîrok û çîrvanoka nekirine, ji gel destûra

wergerandina pirtûk û romanên kevnepî (wek: Platon, Arîsto, Marks...) û yên hemdemî ku xelata Nobelê standine dixwazin û doza kirîn û xwendina wan berhevan li gelê me dikin. Gelê me hê hîni zimanê Kurdî nebûye. Ev salek e ku rojnameya Welat, kovara Rewşen û şewq meh e kovara Nûbihar derdikevin. Kurteçîrokan, metelokan û tiştên ku bala gel bikişîne dinivîsin û diwêşînin. Gel, hêdî hêdî hîni xwendin û nivîsandina zimanê Kurdî dikin. Erk û pey-wirên(wezîfe) xwe bi zanistî bi cih tînin. Weke ku zarokê bixwedî bikin.

Berî ku dest bi wergerandina berhevan bikin, divê werin welêt, lêgerî û lêkolînê xwe bikin. Bizava wan divê li gora rewşa gelê wan be. Nivîskar, divê rewşa gel û welat bizanibe. Gelê xwe ronakbîr û welatê xwe ronahî bike.

Di demeke kevin de kerwanek ji Kurdistanê bi kerwanî çû bûne hecê, nepirsî dimeşîyan. Meke derbas kirin û ketibûn ser rîya Yemenê dikudandin. Roja weqfê hişê wan hate serê wan û pirsîne. Ma kanî ev Meke li ku ma? Yê Yemenî got: "Ma hûn ji ku ve tîn?" Gotin, "Em ji Kurdistanê tîn." Yê Yemenî gote wan, "De bi şûn de vegerin, hûn ji hecê derbas bûne." Bi şûn de vegeriyan û ji heca xwe jî man. Wiha jî li nivîskarên me yên li Swêdê hatiye. De bi şûn de vegerin lê hûn di gel û welat derbas bûne. Nivîskarên heja, li welêt hîna belavkirin û xwendina rojnameya Welat berhend kiriye (qedêxe kiriye). Xortên Kurda bi dizî û qaçaxî belav dikin û dixwînin. (Binêr: Rojnameya Welat, hejmar 61, rûpel 2. Xortekî Kurd ji Midyadê çî dibêje: "Piştî demekê bayiyên rojname-

yan, dîsa rojname nedifirotin. Me jê pirsî, hûn çima Rojnameya Welat nafirosîn? Bayî jî got: Ji bo ku polis û cerdevan me tehdît dikin, em rojnameya Welat nafirosîn. Ez soz didim ku, serê min jî jêbikin ezê rojnameya Welat bixwînim." Erê rewşenbîr û nivîskarên me yên li Swêdê yên xwe nenas. Qey hûn naxwînin, nabînin û nabihîzin xwendevanên li welat di çî rewşê de ne, di bin çî pest û zorbaziyê de ne. Ji bo xwendin û belavkirina rojnameya Welat, serjêkirina xwe didine ber çavên xwe. Bi dizî dixwînin û bi dizî didin hevalên xwe, dawî diçirînin an jî agir pê ve didin û dişewitînin. Em di çî rewşê de ne, hûn doza pirtûkên xwe yên wergerandî ku xelata Nobelê standine li me dikin. Heta serê we ev serî be em û hûn de ji hev û du dîr bin. Li min negirin ew mirovê ku welat û nîştîmana xwe nas nake, xwe jî nas nake.

Civak weke mirovan, weke mekîne ne. Mirov di temenê 6-7 salî de, de û bavên wan, wana dişînin dibistanê. Mamoste, di destpêkê de wana hîni tîpan dikin. Dû re kîte, bêje, biwêj û hevokan digel wêneyan nîşanî wan didin. Sal bi sal serdest dibin, erk û peywir li wana giran dibin. Mejiyên wan û tîgî-hîja wan fireh dibe. Hîndekariya navîn diqedînin paşê diçin amojgeh û zanîngehan. Di erebeyan de 5 vîtêzên bi pêşveçûnê hene. Dema tu wê bişuxulîni, divê tu wan vîtêzan bi rêz bi kar bîni. Di vîtêza 4 û 5'an de mekîne rana-be. Civaka me di warê xwendinê de hîna di dibistana yekemîn, sinifê yekemîn de ye. Mamosteyê zana û mîsoger, dizanin bê wê çawa seya (deza) suxtiyên xwe bidinê û suxtiyên xwe û perwerde bikin. Ji tîpan

dest pê bike û bi rêzê kîte, bêje, hevok, biwêj, paşê derbas be dirok, erdnîgarî, wêje, roman, felsefe, mantik û sosyoloji. Di qurteyên xwe de, ew jî vana dibêjin, lê dema ku berjewendiyên wan li holê bin van mîsogeran diavêjine piştî guhê xwe û lê nabin xwedî.

Divê em çavkaniyên xwe bixebitînin. Ew jî tîra wî şuxulî dikin. Di vî warî de çand û wêjeya me zehf dewlemend e. Dîmena nava Çemê Hatxê, ji wêneyê bi nav û deng (pare pare) ku, hûnermendê nemir, wênesazê Îspanyol Pîcasso afirandiyê, pirtir hikariyê (tesîrê) li me dike. Pêdiviya me bi sloganên (dirûşmeyên) Ewropî nîn e. Ew sloganan tu hikariyê li me nakin û me bi hêrs jî nakin.

Heta em hîni wan sloganan bibin wê demekê dirêj di ser me re derbas bibe. Em bi sloganên xwe jî ne qayil bin û dev ji wan berdînin, bi hîndekariya (elimandina) dirûşmeyên Ewropî dakevin emê gelekî li paş bimînin. Ma ew nayê wê wateyê ku pêdiviya me bi zanistiya (ilmê) Ewropa û yê hemdemî û kevnepî qet nîn e. Lê di pêvajoyek fireh û dirêj de em dê wê jî bi kar bînin.

Birano ji ber pest û zordariya dagirkeran, xela xwendin û nivîsandinê bi ser me de hatiye. Xwendina kurteçîrokan bi dest me nakeve, heta em kurteçîrokan bi Kurdî dinivîsin em ji tirsan hêkên hesinî dikin. Em newêrin navê xwe yê mîsoger li bin deynin. Hêzên dagirker, li malekê rûpelekî bi Kurdî nivîsandî bibînin, wê malê dişewitînin, zarok û pîrekan binçav dikin. Li herêma rê di girtîgehan de nemaye. Ew li Swêdê di firehiyê de ne, îşkence, binçavkirin, dadkirin (mehkemekirin) û kuştin ji wan re nîn e, pest û zordarî jî nedîtine. Ger hûn rastgo (dirust) bin, îro werin welat, bipeyvin û bi navê xwe yê mîsoger (gerçek) gotaran binivîsin. Em we bibînin.

## XAÇEPIRS

### Amadekar: Rasto Zilanî

**Çeperast:** 1-Helbestvanekî Fransîz. Sosyalîst bû. Li hemû dinyayê bi helbestên ku, der heqê çavê evîna xwe Elsa de nivîsiye nav daye. Di nava pirtûkên wî de yên herî bi nav û deng ev in: Çavên Elsa, Ji Elsa re Helbest, Evîna Bextiyar Tune. Di wêne de tê dîtin / Komele 2-Îdarevan, kargêr/ Karker 3-Sembola Magnezyûmê/ Bajar 4-Kîrêmît/ Danê ku piştî roj diçe ava/ Sembola Radyûmê 5-Sembola Neibûmê/ Cînavka yekemîn a kesane ya yekehejmar/ Li gorî ola îslamê cihê ku mirov roja qiyametê lê dicivin 6-Nik, bal, di gel/ Yaxût 7-Vîn 8-Bîrêz/ Navê filmekî Spîlberg 9-Sosyolojîk 10-Mirov pê porê xwe rast dikin/ Navê sazgeha Amerîkî ku cihê lêkolîneriya gerdûnê ye

**Serejêr:** 1-Mebest, xaye/ Birêveçûn 2-Xebatkariya çandiniyê 3-Vexwarinek/ Plaqa Teywanê 4-Mezin, girs/ Destûr 5-Navê çemekî mezin ku li nava tixûbê Sovyeta kevin e/ Lehçe 6-Negatîv/ Sembola Sodyûmê/ Di îskambîlan de 'yek' 7-Şîrove/ Di matematîkê de hejmar '10' ifade dike 8-Alîkarî 9-Celebêk şanoyê 10-Di sedrencê de dawîya lîstikê 11-Sembola dewletan e/ Li Misra

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12

1															
2															
3															
4															
5															
6															
7															
8															
9															
10															

qedîm navê îlahek 12-Liv, tevger

### BERSIVA XAÇEPIRSA HEFTIYA ÇUYÎ

**Çeperast:** 1-Emîle Zola/ La 2-Teşîrê/ Va 3-Înand/ Marîne 4-RC/ Fanêla 5-Ode/ Ken/ Jehr 6-Leta 7-Ol/ Rê/ Îd 8-Jikele 9-Îvan/ Ker 10-Etarok  
**Serejêr:** 1-Etîmolojî 2-Men/ Delîve 3-Îşaret/ Kat 4-Lînc/ Arena 5-Erd/ Êl 6-Zê/ Fer/ Eko 7-Osman/ Ek 8-An/ Adar 9-Avrêj 10-Aîle 11-Neh 12-Ade

## QERTA ABONETIYÊ

Ji kerema xwe re ji hejmara ..... pê ve min bikin aboneyê rojnameya Welat

Nav:

Paşnav:

Navnîşan:

**Bedelê abonetiye razînin:**

**Li derve:** Y. Serhat Bucak

İş Bankası Cağaloğlu Şub.

Döviz tevdiat Hesap No: 3113617

**Li Tirkîyê:** 385393

Ji kerema xwe re vî cihî dagirin û tevî kopiyeye pelê razandina bedelê abonetiye bişînin.

**Navnîşana Welat:** Başmusahip Sok. Talas

Han 16 Kat:3 No:301 Cağaloğlu / İstanbul

Tel: 513 34 33 Fax (Tel): 511 50 07

### Mercên abonetiye:

	Li hundir	Li derve
3 meh	60.000	30 DM
6 meh	120.000	60 DM
12 meh	240.000	120 DM

# Malka min te ji qurcî alî felek tê

Zarokno! Ez dixwazim qala lîstikek zivistanê bikim. Wê lîstikê şevên me yên zivistanê xweş dikir. Navê wê lîstikê "Malka min te ji qurcî alî felek tê" ye. Lîstik di navbera zarokan de, di navbera mezinan de, di navbera xortan û keçikan de jî tê lîstin.


Di şevên zivistanê yên dirêj de carina cîran dihatin diçûn ba hev. Şev li hev xweş dikirin. Em zarok pirr şa dibûn. Mezinan yarenî dikirin di nav hev de. Şev xweş dikirin. Qala her tiştî dikirin. Carina jî çîrok digotin, kilam distiran û dileyîstin. Wiha heta nivê şevê henek dom dikirin û diçûn. Ji nav van lîstikan yek jê "Malka min te ji qurcî alî felek tê" bû. Şevên me yên zivistanê pirranî bi wê lîstikê dixemilîn. Me ev lîstik bi dê û bavê xwe re, bi apê xwe re, bi xaleta xwe re, bi xalê xwe re, bi bira û xwişkên xwe re û bi hevalên xwe re dilîstin.

Bi navê wan lîstikan, me hem şevên xwe yên zivistanê xweş derbas dikirin, hem jî me gundê xwe rind nas dikir. Di kîjan malê de çiqas mirov dijîn? Ji van mirovan çend mên in, çend jin in? Di wê malê de çend zarok hene? Ji van zarokan çend keçik in, çend lawik in? Di malê de xort hene an tune ne? Xesû û xezûr heye, an tune ye? Di malê de ap û met, xal û xaltî heye tune ye? Mêrê kîjan malê tune ye? Ew mal li kîjan alî gund dima? Li der û dor kîjan mal hene yanî cîranê xwe kî ne?

## LÎSTIK ÇAWA TÊ LÎSTIN?

Ên dilîzin dibin du birr. Li her birrî çiqas mirov dibene girîng e. Di birrekê de pênc mirov jî dibin, mirovek bi tenê jî dibin.

Me êdî zehf bi dayikên xwe re dileyîst. Dayîka me dibû hêlek em jî bi birayê xwe Osman û bi xwişka xwe Fatê ve dibûn hêlek. Em li derdora dayîka xwe digihîştin hev. Dayîka me jî, ji hêlekê ve teşî dirêsiya, dirûn dikir, an jî bi tiştêkî din re mijûl dibû, ji



hêlekê ve jî bi me re dileyîst.

Me di nav hev de biryar da şeva dayîka me dest bi lîstikê dikir.

– Êêê.. Malkê min te ji qurcî alî felek tê... Pênc jin û çar mên.. De bizanin hêla mala kî ye?

Hema malên bi pênc jin û çar mên dihatin bira me, me digot. Bersiv nedibû. Me yê dest bi hejmartina malên gund bikira, ji jêr de, ji jor de çiqas mal hene, me yê di hişê xwe de çax kira. Malên bi pênc jin û çar mênî me yê di ber çavê xwe re derbas bikira. Ji hêlekê ve me dikir "bile bil". "Mala Memedî Mîmê nabe.. Mala Nurî Şêxê nabe..." Ji hêlekê ve jî, me

bira û xwişk bersiv dida.

– Mala Omê Raşê ye.

– Naa, na! Ew şeş mên in.

– Mala Del Memed e.

– Na, na! Ne ew e.

– Mala Saymê ye.

Dayîka me serê xwe dihejand.

– Hinq, digot.

Me yê wê carê dest bavêta serriştê. Li serriştê bigeriyana Me yê serriştê bixwesta.

– Di wê malê de çend keçik, çend lawik hene?

– Di wê malê de sê keçik û du lawik hene.

– Haaa, mala xaltiya min e.

– Na.. Hûn wê malê zor dibînin.

– Peeee! Mala kê ye?

Wê malê tentelê xwe çingaga?

– Çing yan tentelê xwe çingaga?

– Yanî qalê (dewlemend) ye fiqare ye.

– Na ne qale ne, ne jî fiqare ne.

– Hii, mala Hûsî Reşî e.

– Ne mala Hûsî Reşî e. Rind bihizirin.

Me yê wê carê serî bi ser hev da em çî bikin, çî nekin? Me gund qebile qebile di nav hev de par dikir. Yek ji me malên Qerecan bihizire. Yek ji me malên Alok bihizire... Û dîsa me yê bersiv bidana.

– Mala Zebê Mistê ye.

– Na!

– Malê Hacî Hemzo ye.

– Na!

– Mala Hasî Alkê ye.

– Na!

– Peeee! Vê malikê ta kîjan qurcî alî felek? Di gund de mal neman. Belê ev mal li kîjan alî gund dikeve?

– Ev mal li roja xwe çaxî mal e, li rojavayê gund dimîne. Vê carê jî, me hişê xwe çaxî li rojavayê gund dimînin dikir. Carina jî bavê me dikete nav lîstika me. Digot:

– Min ev mal derxist. Ez dizanim mala kê ye?

Emê hema çaxî bavê xwe bûyana. Me yê bixwesta ku bersivê bide me. Li ber digeriyana, carina bersiv ji me re digot. Carina jî digot: "Hûn bi xwe bibînin."

Emê dîsa çaxî malên gund bûna.

– Li rojavaa.. Mala Tat Bayram me got.

– Na! Ne mala Tat Bayram e.

Herik me mal nedizanî em li serriştê digeriyana. Di wê malê de hesp hene, ga hene? Di wê malê de bûk heye? Ew mala nêzîkî mala me ye? Jina wê malê ji gund e? Serriştên wiha dirêj dibûn diçûn. Heta me mal dizanî me yê pirs kira.

– Mala melle ye.

– Erêêê. Mala Melle ye.

– Peeee! Di mala melle de pênc jin û çar mên tune ku?

– Heye heye. Melle bi du jin e. Hêwî ye. Hêwî ji bîr mekin.

– Haaa. Min kut ji bîr kir.


– Vê carê em pirs dikin.

Me yê serî bi ser hev de bihiziriyana. Em maleke wiha bibînin ku dayîka me şûnake vê malê ji qurcî alî felek dar xwe. Wextek dayîka me nedizanî pirr li kêfa me dihat. Em şa dibûn. Dikeniyana. Dayîka me ji bo me şa bike xwe li nezanî datanî û dirêj dikir. Malên gund gişt dihejmart.

Me bira û xwişk biryara malê de şiva pirskira.

– Malkê min te ji qurcî alî felek tê. Heşt jin û şeş mên...

Lîstikê wang (wiha) dom dikir, diçû.



# Helbestvanê Geliyê Zîlan: Mele Evdirehman Çelebî

● *Li gorî Mustafa Çelebî (Mele Evdirehman Çelebî birê wî ye) ev kes di sala 1921'an de li gundê Dilanê tê dinê, di sala 1975'an de jî diçe ser dilovaniya xwe. Mirina wî bi qeza trafikê dibe, cihê ku lê qeza derbas kiriye li ber gundê Qeremelikê ye. Mele Evdirehman niha li gundê Qerekilîsê di mexberekê de razaye. Der heqê Mele Evdirehman de malbata wî û hinek kesên din ji me re minakên heja dan.*

## M. Zahîr Kayan

Dema em çûne Ercîşê pêşî em li dikana Mahmut Çelebî bûn mêvan; ev kes, mirovekî zana û bi rûmet bû. Wî em şandin gundekî Ercîşê Qerekilîsê. Di hundirê minîbûsê de me kêfxweşî da gundiyan û wan jî bi rûçikekî xweş em bersivandin. Dema em çûn Qerekilîsê, minîbûsê em birin li ber derê mixtarê gundê kevin danîn. Kurê mixtar Ehmed Çelebî, xortekî pîr zana û şoreşger bû, bi me re tîkiliyeke xweşik çêkir. Em li bexçeyên wan rûniştin û me armanca xwe ji wan re got: "Em der heqê Şerê Geliyê Zîlan de nimûneyan berhev dikin, li mirovên di wê demê de jiyayî digerin. Ev kes divê bila mêr, we divê jî bila jin bin. Ango kî der heqê wê demê de bi axive ji bo me girîng e." Paşê wan em birine cem pîrekê, navê wê Besê bû. Wê ji me re der heqê qetbirra Geliyê Zîlan de gelek minakên heja dan. Ber bi êvarê em hatin li mala mixtar (mixtarê kevin) Mustafa Çelebî rûniştin, di nava sohbetên me de wî qala Mele Evdirehman Çelebî kir.

Li gorî Mustafa Çelebî (Mele Evdirehman Çelebî birê wî ye) ev kes di sala 1921'an de li gundê Dilanê tê dinê, di sala 1975'an de jî diçe ser dilovaniya xwe. Mirina wî bi qeza trafikê dibe, cihê ku lê qeza derbas kiriye li ber gundê Qeremelikê ye. Mele Evdirehman niha li gundê Qerekilîsê di mexberekê de razaye. Der heqê Mele Evdirehman de malbata wî û hinek kesên din ji me re minakên heja dan. Mustafa Çelebî der barê wî de wiha digot: "Mela, mirovekî pîr zana bû, medrese xwendibû û ji helbestvanîyê pîr hez dikir. Gund-gund digeriya û ji civatan û cimaetan nediqetiya. Li gundên dereke dihatin ew dibirin jê tişt hildidan, ji ramanên wî hin tiştan hîn dibûn. Wî ge-

lek helbest çêkiribûn û bi alfabeya Erebi helbestên Kurdî dinivîsand, li her derî jî însanan re dixwend. Di odayên gundan de, di civatên axa û began de cihên wî tim û car li jor bû, ku xeber dida hemû civat li devê wî dinihêrt." Dîsa der mafê Mela de Mahmud Çelebî wiha digot: "Mela nezewicîbû, lew mirovekî bi ger bû, tim û car digeriya û li cihekî nedisekinî. Mela li Kurdistanê li gelek cihan geriyabû, ta Hekariyê çûbû, ew Serhed wek gundê xwe nas dikir. Ji xwezayê re xeber dida, bi kulîlk û çivikan re dikete gengeşiyê û bi wan re hevaltî dikir. Gelek helbestên wî hebûn, lê wisa jî mirovekî mîzahçîbû, biçûya ku derê gorî xûy û xisletên wir helbestên pêkenî diafirand, qisûrên însanan, nerindiyên wan, pêşkê jinan, hundirê mala û necamêrtiya însanan û hwd. giş di helbestê Mela de he bûn. Hinek helbestên wî hebûn wek helbestên şairên Kurd ên berê. Di bin tesîra Melayê Cizirî de dibe mabe. Lew hinek helbestên wî gorî çêkirina helbestên helbestvanên Kurd ên klasîk in." Li Ercîşê jinekê jî der barê Mela de wiha digot: "Mela mirovekî gelek serwest bû, ew xettat bû, bi Erebi xetên xweş çêdikirin. Lê hunerê mela tenê ev jî nîn e. Ew li Geliyê Zîlan di şikefta Qulaşevderê de Şahmaran ditibû. Çawa ku dibêjin Mela diçe dikeve şikeftê, wê demê di hundirê şikeftê de du çavên wek lokiz vedikeve dibîne û wê demê ji xwe ve diçe. Paşê radi-be lê dinihêre ku, jineke bedew, heta berpêşîrên xwe însan e, pêşîrên xwe jêr de mar e. Bi Şahmaran re dipeyive û paşê tê wêneya Şahmaranê bi destê xwe çêdike."

Der heqê mela de ji malbata wî û ji gundiyan gelek nimûne belav kir. Lê hezar heyf û mixabin helbestên mela bi mirina wî ve gişt wînda bûne û ewê ku hatine nivîsandin, ew jî wînda bûn. Li ser helbestên Mela de


birayê wî ji me re çend helbest gotin û li ser mijarê wî yên pêkenî de jî me di nav gel de hinek nimûne civand.

Ev helbest birayê Mele Evdirehman Çelebî, Mustafa Çelebî bi ezber ji me re got. Gorî Mustafa Çelebî, helbestên Mela pîr bûne, lê di bîra wî de ev helbest mane.

Şerê di heft bavê xwe şer  
Dawe nake nabê ez şer  
Tolê li pey heft kopek

Ewt ewt dike dibê,  
Eslan im ez.  
Ew kund  
Birayê bazî ye  
Ulul dibê  
Terlan im ez  
Sûret ji  
Rengê ziblî ye  
Reş, reş dibê  
Mercan im ez  
Nanê cehî  
Têr naxwin  
Tişteki ji  
Sifrê daniye  
Simbêl li çavan  
Bel dike  
Sûbaşiyê  
Qewman im ez  
Erdê....  
Serdêl bi nav e  
Tu bişo  
Lehlê bi av e  
Lê werî  
Misk û gulav e  
Aqûbet  
Şibhê kulab e.  
Meclîsa zircahilan  
Kes ranabit bê birîn  
Garana ker tê hebit  
Xalî nabe jê zirîn.

Em li Ercîşê şevêki sekinîn, biraziya Mele Evdirehman Çelebî ji me re ji helbestên Mela yên pêkenî gelek nimûneyên heja got. Gorî gotina biraziya Mela, Mela li dilanê diçe malekê jê re nan û toraq û penêr tînin, vêca di nava penêr û toraqê de kurm derdikevin. Li ser vê rewşê Mela helbestekî pêkenî diafirîne. Wek toraqê  
Wek jajiyê  
Se birrî  
Porê kebanîyê  
Ew toraq  
Mîha kew e  
Kurma tê de  
Mewe mewe.



Li Geliyê Zîlan helbestvanekî Kurd ku nayê zanîn

Toraqa  
Hedo medo  
Eyar dane  
Pişta Edo  
Edo bire  
Devê golê  
Hewar dabûne  
Qereqolê  
Miaynê kir  
Kurma tê de  
Çilape kir  
Dibê Edo  
Çengek devê  
Xwe kir  
Ji Edo wetrê  
Şîr û şekir.  
Wey toraqê  
Wey jajiyê  
Se birrî  
Porê kebanîyê.

Dîsa biraziya Mela dibêje, Mela li gundekî dibe mêvan, li wir bûka malê emenî û xalîça çêdike. Li ser qilçekî xalîçeyê jî navê xwe nivîsibûye: Sêvê. Vêca xwediyê malê dizare dibê ez mirovekî pîr xizan im û çêkirina wan xalîçeyan jî me têr nake. Li ser vê Mela vê helbesta pêkenî diafirîne.  
Hey Sêvê  
Derdê derdehêlê  
Bikeve dev û lêvê.  
Dibê  
Malxwê malê  
Eva emeniya nefrot  
Perê wê nexiste

Binê cêvê...

Li ser helbestên Mela yên pêkenî Mahmut Çelebî wiha digot: "Mêrikek tewlekî çêdike û pezê xwe dixê, lê tewle hurdişê, li ser vê bûyerê mela helbestek diafirîne:"

Xalê Mistê  
Serê daran da  
Ser bistê  
Gom rind  
Ava kir  
Pez xistê...

Gundiyan digot: "Rojekî Mela diçe gundekî ku li jineke cinanketî binêre (Mela ji nivîştan û ew pêkanînen olî tu car bawerî nake. Bersiva van tiştan gişt bi hiş û fêm dide.) Bala xwe dide jinik dest bi wan leyfîstîkên xwe dike, "Çi ye bi cinan ketiye?" Der heqê wê de ji xesûya wê hinek pirsan dike, paşê jî diçe ji bûkê re (jinika cinanketî) xeber dide û di dawiyê de bûkê tê rê û armanca xwe ya rastî qise dike dibêje: "Wele ez dixwazim ji mala xezûrên xwe biqetim û ew jî nahêlin, ji bo wê min xwe avêtiye cdîniyê."

Hinek giliyên Mele Evdirehman Çelebî:  
Kerekî dûvdîrêj  
Çêtir e ji  
Şêx û meleyên qîrêj  
Qedrê gulê çî zanît  
Kermêş dibê kerê reş...